

# PÊNÛSA



# NÛ

Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê

rojnameyeke çandî ye , ji weşanên Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê - hejimar ' 5 ' çirya pêşî 2012

## Arşek Baravî

“gotina Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê ya li bin konê behîdariyan (Şehîdên derya Izmîrê) ji aliyê Arşek Baravî ve hate xwendin”



## ERÊ AMÛDÊ

Erê Amûdê..xelekên rista mergesatan dirêj dibe û dawî nayê, çerxa demê li te bi kîne.. te dêşîne û te dilorîne, her ku bobelatekê bi serê te tîne.. xelekên ewê ristê yeka yeka vedijîne û dibîra gelê te tîne.

Vaye tê dîsan weke toşê û sînemê, mîna zindana hesekê û zordestiya recîmê.. xwe bi perdeya reş bixemilîne, konê şwîniyê û behîdariyan vegire ...qey ev dawerê teye Amûda pakrewanên bêguneh.

Gelê te bergûrî asîmanan dibe , diqîre, dike hawar, lê ew jin û mendal û zarokên reviyayî.. revend û koçberên dema berovajî , di nav pêlên derya Izmîrê de noq dibin, li ber xwe didin, gazî nîne..tenê yazdan wan dibîne ,ew jî bi hewara bindestan ve naçe, ewî jî dadmendî jibîr kiriye, ew û setemkar hevpeymanin..haware.. heware ..ha..wa.re ...

Tu bi hejmara xwe biçûkî, lê bi nav û dengê xwe mezinî ..û Sosreta te jî pîrr mezine Amûdê, tew tu hêna mîna firîşteyekê bi ronahî.. nav di gelê xwe didî û dibêjî: xelkên min.. ez dayika we me û têra we heme, bi we ewleme, canên wan goriyan lav û hêviyan .. ji we re dişînin..hevdû tawanbar mekin, hevdû gunehkar mekin, tu kes naxwaze mala xwe bidestê xwe hilweşîne, bextê we bi reşe, ne hûn gunehbarin, lê dem gunehbare.. ma gelo ewên ku doza azadiyê dikin û her rojê bi sedan têne kujtîn gunehê weye? Na..tev de gunehên xweperestên zordarin.

Hogirno..gelê Amûdê..malbatên bakrewanan..dilsojên xemgîn, Perîşanî û xizaniya we..lehengên pêdarî û hewildanan çê dike.., rejîma setemkar belengazî û perîşanî kiriye para we.. her derfet û delîve, rê û rêçan li ber we girtine, tenê êş û jana biyaniyê ji we ne stendiye, xwas û tazî dinya sar.... zikê birçî tune war....keriyê pezin barebar, doşek xaka cîhane ...lihêfa wan ezmane.. jin û mêr, zarok û mendalên we ..lehengin, koçber dibin, penaber dibin, da xweşiyê ji we re bînin, lê feleka bêbext di rû wan de derdikeve....

Çekên lehengên we ne top û tivingin, çekên wan omîd û hêvîne...

Vê carê jî kerwanê lehengên we.. berê xwe dan cewşena felekê, lê ew derya Izmîrêyî bedew, bi dîmenê xweyî bengîn, bi hezaran kes di ser xwe re derbas kirine.. nikarî bû barê keştiya lehengên me jî hilgirta, xwest wan hambêz bike, bi stendina canê wan şa bû, lê termên wanî sar.. bi darbest û tabûtan li goristana Amûdê vegeyriyan, bi hênkaya paxila derya Îce qayil ne bûn, vaye hatin .. bi mizgîniyeke reş hatin..da li Amûdê biholisin, eve dawerê meyî reş, eve tariya ku em hînî wê bûne û di siya wê de..em û kul û derdên xwe bi hev re dijîn.

Xelkên Amûdê: Dexs û zikreşiya kesên lamij..we dixapîne û dişkîne, we li hev gurîx dike da lawaz bibin û we bimirîne, haydar bin dem jî derewîne, de sûdê ji pend û serbûriyan wergirin.. da hûn mîna lehengan neyarên xwe bilerizînin, evê xaka birîndar di evan bûyeran de bi hişmendî .. bi tovê hevgirtinê biçînin, da ku canên dayik û mendalên bêguneh bi hêmenî di nav pinpinîkên buhuştê de li ser kulîlkan bigerin û xweşiyê bibînin. Hêjaye di vê rojagiran de em ji hev re bibêjin sersaxî a me tevane, belengazî a me bindestane, xemgînî a hemû kurdane.

## KURT û KURMANCÎ AX-NAME

*Ji dostên axê re, Berî „kasa mirinê“ bi bostekê...*

Dinya, gîrekî bi qasî Xwedê, mezin e; bi qasî Xwedê, hebûn û tunebûn; destpêk û dawî ..... Rûpel (3)

## MARÊ DI ZIK DE

-Ez çi bikim ji vî marê zikê xwe?

Hevalê wî got:

-Marê çi kuro? Tu dîn bûyî?

-Bişev, beriya razanê tiştê li ser dilê min diçe û tê.

) 1..... Rûpel (1)

## Hevpeyvîna Pênûsa Nû bi Can Kurd re

**Serok û rêberên partiyên ji tîrsa kuştinê reviyane başûrê**

- *tevgera siyasî hîn negihaye asta tevlêbûna gel di serhildanê de.*
- *Bi darê zorê peyman naçin serî.*
- *Hîn partî ketine bercewendiya sîstema Esed.* ..... Rûpel (9)

## Ji folklorê kurdî

### Dostaniya rast

Rojekê mîrê bota bang kire wezîrê xwe û jêre got: ti bixwe zanê ez tiştêkî divî welatîde bê şêwrate nakim, ji ber ev bû çend sal tu wezîrê min î û min ji rastiyê pêve li dorî te nedîtiye.

Lê îro ezê bite ..... Rûpel (8)

## XELÎL XEYALÎ MOTKÎ KÎ BÛ?

Xelîl Xeyalî (1876-1926 ji Modkê ye, ji qebîleya “Mûdan” e. Li cem Se’îde Nûrsî (1876-1960) ders girtiye û gelek di bin bandora wî da maye.

Di dawiya sedsala 19an de çûye Stenbolê û li wê derê li ser xwendin û ..... Rûpel (7)

## BAJARÊN XWÊ NAS BIKE ZAXO

Zaxo, yek ji qezayên Herêma Kurdistanê ye û dihête hijmartin yek ji dergêhên welatî bû derveyî cîhanê. Navenda qezayê bajêrê Zaxo ye, ku dikeve başur-xoravayê deşta Sindiya ya navdar bi axa xwe ya bi bereket..... Rûpel (4)

## BONIYE - SUAD CEGERXWÎN WÊRE

### BIHEVRE VEGERIN

Ev warê ha ne yê me ye

Şoreşa me va gur dibî

Omîda me her pê re ye

..... Rûpel (14)

## Gava xewn bin av dibin Bexşan

*Ji bo ewan hêviyên ku di Deryayê de bin av bûn*

Hîna mirin

Ne gihîştibû Şar

Lê li hawîrdorê wî dileyizî

Min xewnên xwe

..... Rûpel (17)

## CÎHAN KAL BÛYE

Kalê Xişo, bi piştî ku qulûsî bîbû û bi liva kalbûnê re bi gopalê xwe, bi koteka di hulhulî. Taqeta wî kêm bûbû, lewma jî serê çend gava radiwestiya û di ber xwe dikire kurtepişt. .... Rûpel (12)

## Miradê Sêvê 1922-1976 Endezyar û Pispore hilkirina maîn û Bimbê Sînoran

Piştî Peymana Saîks-Pîko, û perçebûna Kurdistan, û xetkirina sînorê serxet û binxet ê, ku hate naskirin bi navê xeta Ferensawî, di navbera Sûrî û ..... Rûpel (18)

## SEROKWEZÎR, ZERDUŞ Û AVESTA

Serokwezîrê komara Tirkîyê R. T. Erdogan kurdan û hêza siyasî û rêxistinî a kurd bi şeytanperestiyê suçdar dike û dibêje: “Ew Zerduşî ne, bi şeytan digrin, wek pêxemberê xwe Zerduş qebûl dikin Şeytanperest in.” Û li gor meşreba..... Rûpel (6)

# Dr. Ehmed Xelîl

dralkhalil@hotmail.com

## Deh tembî ji bo ramyarên kurd (Tembiya 7an)

### Kesayetiya Kurd Sererast Bikin!



**Dîrokvan Will Diyurant** di goteneke xwe de dibêje: "Gelek aloziyî û revderbûnên Ogostos di hundira mala wî de bûn" (**Will Diyurant: Çîroka şaristaniyê, beş 10, rû 42**), Ogostos şahekî roman î navdare bû, sala (14 z mir), û ewa damezrênerê imperatoriya Romana ye.

Bi rastî gelek alozî û revderbûnên me kurdan jî di hundirê mala me de ne, berê min ev mijara di hinek vekolînan de dabû xuyan, û divyaye ewa bibe armanca vekolîneke serbixwe û fireh, lê niha werin em binêrin gelo rewşa hundira mala kurd çawa ye? .

Hundira Mala Kurd:

Emê pir bi kûraniya dîrokê de nerin, emê ji çerxa (16 z)de dest pê bikin, bi taybetî, ji cenga Çeldêran de (1514 z)de, wê çaxê Osmanîyan û Sefewîyan welatê me di navbera hevde pareve kirin, di pêre, di destpêka çerxa (20 z)de, dewletên ku ji paşela peymanê Saykis- Piko biderketnê welatê me dobeke din di navbera hevde pareve kirin, nasnameya me veşartin, kultûra koletiyê di kesayetiya me de çandin, em jî hin sinciyên me yê resen bidûrxistin, bîrewariya me ya neteweyî vala kirin, gîl û gemara xwe xistin bîrewariya me.

Hinan jî rîsipiyê me digotin: "Siltan Ebdilhemîd nemazliqa xwe li ser ava deryayê rêdixist, û liser nimêj dikir": Hele wa binêrin çawa dagîrkeran hovîtiya xwe dikirin nikarbûneka (مُعْجَزة) gewre? Û ta çi asteyê bavpîrên me dixapandin?

Erê, aloziyên hundirê mala gelê kurd, yek ji mezintirîn sedemên têkçûna şûreşên me bûn, û kirin ku baweriya hinek entilcênsiya kurdan bi neteweya xwe lawaz bibe, û xwe bi ser gelên biyanî de bijimêrin, di va babetê de Debilyû Arfermandarê Hewlêrê yê inglîz dibêje: "Piraniya serokên kurdan bi pozbilindî dibêjin ku koka malbata wan erebe, her yek jî wana hewldide ku damarên malbata xwe bigihîne pêxember, an malbata yekî jî dûvelangên wî" (**Debilyû Ar: Bîranînên Debilyû Ar, rû 114**).

Va lawaziyê hêşt ku ramanbîr û helbestvanekî kurd wek Mihemed Ziya navê xwe jî navê xwe yî resen dawşîne, û navekî tirkî (Guk Elp) biserxwexîne, û bingeha Toraniyê di pirtûka "Rêbazên Neteweya Tirkî"de bicih bîne (**Conatan Randl: Gelekî li dij hev, rû 352**).

Va lawaziyê hêşt ku kurdekî wek Ismet Înunu gef û guran bide kurdan û bibêje: "Di vî welatî de, ne ji mafê tu gelan- ji bilî gelê Tirk- daxwaza mafên regezî (itnî) an neteweyî bike," (**Conatan Randl: Gelekî li dij hev, rû 342**).

Va lawaziyê hêşt ku kurdekî wek Alî Salih Se'dî, sekretêrê Partiya Be'is yê Iraqê, kurdan haydar bike sala (1963) ku ewê êrişan bajo ser wan, û hêşt ku bi serkêşê gewre Mele Mistefa Barzanî û havêlê wî re bibêje: "Berge ji we re 24 katjimêr, da ku hûn xwe radestî me bikin, an jî emê we tar û mar bikin" (**Dana Ademz şmidt: Gerek li welatê lehang, rû 355**).

Va lawaziyê hêşt ku kurdekî wek zanyarê ola islamî duktur Mihemed Se'îd Remezani Botî, guh nede bêtarên ku bi serên kurdan de rijyanî, û dor sala (2003) li şamê (Dimeşq) xwe jî kurdan dawêşîne, û bibêje: "Ez koka xwe ya neteweyî dixim bin pêya xwe", sedema va helwesta susret cibû? Sedem ewbû ku partiyên kurdên başûr li dijî Emerika neketin cengê, û Seddamê faşist yî dernexûn neparastin!

Va lawaziyê hêşt ku kurdên xiniz (çaş), ji nişkava wek kuvarkan, tevî her şûreşeka kurdan biderkevin, û bibin alîkarê dijmin, û hêşt ku (70) parlementerên kurd, di Perlemanê Tirkiyê de jî endamên partiya AKP ya toran- islamî bin.

Bi rastî lîsteya kurdî ya reş dirêje, û bêguman, ciyan û hizra êlîtî kir ku kesayetiya kurd jî hundir ve lawaz bibe, û belengazî, nezaniyê û belavbûn cihên xwe di nav civata kurdan de bigrin, û wan jî rêya şaristaniyê bidûrxîne. Eva rasteqîneke, lê ji yalîkî din de jî, ciyan û hizra êlîtî bi xwe kela dawî ya ku kesayetiya kurdî jî hilweşandinê parastin.

Erê, pendek heye dibêje: "Carcaran sûd di ziyane de heye", çûnkî ciyan û hizra êlîtî nehêştin ku pirojeyên dagîrkeran bi serî bibin, kurd jî qirkirinê parastin, û di her demekê de qehremanên gewre di civata kurdan de peyda dikirin, ewên ku geyana kurdayetiye diderbirandin, yek ji wan ew serokê êlîtî bû; yê ku sala (1675 z) gotibû: "Ez, ne Siltanê Osmanî imperatorê va xakê ye, erê, dibe ku ewa ji min bihêztir be, lê ez ji wî koklitir û mirovbendtirim" (Erşak Safrastyan: Kurd û Kurdistan, rû 89).

Piştî (25) çerxên dagîrkeriyê, wa binêrin gelê me derbasî çerxa (21)an bû, ew derbas bû û hên li ser xaka xwe dijî, û jimara wî jî pire, û dizane ku ew (kurd); eva jî bi xwe destkeftinên başin, û divyaye ku em dapîr û bavpîrên xwe yê ev destkeftinan bêkanîni spas bikin, lê tevî vê jî pêwîste em riyalîti bin, û bibêjin: Raste, em gihêştin çerxa 21an, lê li dirêjiya 25 çerxan gelek neçêyan cihê xwe di kesayetiya me de girtin, û pêwîste em xwe jê rêzgar bikin.

#### Kar û Barên Zûkanî:

Çaxa Napilyon li dijî mîrîşanên Alman biserkeft, feylsûfê neteweya alman Fixtê (1814 z. mir) got: "Me her tişt biderda, lê hên perwerde bi dest me de heye". (Can Toşar û hin din: dîroka ramana ramyarî, rû 384). Bi rastî me kurda jî gelek tişt biderda, lê nûavakirina kesayetiya me ya neteweyî bi dest mede ma heye; ev bara jî dikeve ser milên ramyarên me, bi yardimiya rewşenbîrên me, û di va çarçewê de em evan pêşniyaran pêşkêş dikin:

**1 – Di Warê Neteweyî de:** Wate ewe ku divyaye hişyariya neteweyî di dil û heşan de were xweşkirin, û li gor mercên rojane were pêşxistin, eva jî bi du tiştan pêktê:

Naskirina ziman û dîroka me ya neteweyî; çûnkî gelê ku ji ziman û dîroka xwe were bidûrxistin bê damar dimîne.

Girêdana nîşên me bi pêşengên me ve; çûnkî nîş ji pêşengan hînî serfiraziyê, mirovbendiyê, lehengiyê û cangoriyê dibin.

**2 – Di warê Zanahî de:** Gelê nezan ne dibe yek, û ne jî dibe xwedî hêzeka gewre, û nikare rûmeta xwe biparêze, erê, çareserî di zanebûnê de ye, û da ku kesayetiya zanahî avabe, divyaye pirojeyên bi rêk û pêk hebin, rêzikên xwendina bi sûd di nav gel de werin bicihkirin; çûnkî gelê nezan cihê xwe di dîrokê de nîne, û bi xwendinê gel dibe xwedî zanîn, ramana zanistî bidestxwe dixîne, bi serda jî divyaye gel hîn bibe çawa bi demê re bide û bistîne, pendek heye dibêje: "Bi min re bibêje tu çawa dema xwe derbsdikî, ezê bi te re bibêjim cihê te di dîrokê de li kujan asteyê ye".

**3 – Di Warê Gewdeyî û Seykoloçî de:** Gewdeyên me espên ku em li ser piştên wan dikevin cengên jiyane, û da ku em biserkevin, divyaye espên me xwedî hêzeka bilind bin; lewre, ji hêla gewdeyî de, divyaye bijîşk, dermansaz di va çarçewê de bixebitin. Û ji hêla seykolocî de, divyaye pirojeyên kultûrî werin pêkanîn; da ku gel jî kultûra koletiyê were rêzgarkirin, ji ber ku kesayetiya qewîn ji hêla derûnî de, ewê karibe bi awayekî erênî bi bûyeran re bide û bistîne, bi serde jî, pêwîste nîrxên payebilind wek (serfirazî, azadî, cangorî, rêzgirtî, hwd) di nav gel de were bicihkirin.

**4 – Di Warê Abûrî de:** Belengazî- wek nezaniyê- kesayetiye jî hêla gewdeyî, ramanî û derûnî de- jihevdiş, lewre, divyaye gel hînî karên bi sûd bibe, her yek di çarçewa xwe de; şivan li zozanan, cotkar li baxan, bazirgan li bazaran, karker li dezgehên, jin li malan,, divyaye rê li tiraliyê û bêkariyê were girtin, û dahatiyên welêt bi sûd werin bikaranîn:


**5 – Di Warên Civatî de:** Divyaye kultûra hevgerîna di nav civata kurd de were bicihkirin, komîten çareserkerina pîrsgirêkên civakî werin damezrandin, û pêwîste endamên evan komîtan xwedî pend û karzanî bin, û tiştê herî grîng ewe ku sinciyên payebilind sermiyana civatê bin (duristî, rastî, dilsozî, dilpakî, dilovanî, cangorî, hwd), divyaye nexweşiyên civatî jî holê rabin, bi taybetî jî di nav ciwanan de, bi rastî her gawek di evî warî de were avêtin ê gaweka gelek girîng be di çarçewa sitratîcî de.

#### Gotinaka Dawî:

Ey ramyarêyên me yê rêzdar! neteweya me di rewşeka awarte de dijî, ewa xwedîyê pirojeyê rêzgarîyê ye, lewre barên awarte dikevin ser milên we, di serî de jî nûavakirina kesayetiya kurdî ya qwîn; çûnkî gelê ku bibe dîlê belengaziyê, nezaniyê, koletiyê û keysbaziyê, zûka dikeve ber davên xiniziyê û jihevixistinê, û ê nikaribe bibe xwedî pirojeyeka rêzgarî ya çetin wek pirojeyê me ya neteweyî.

Ey ramyarêyên rêzdar, helbet we pejirandiyê ku hûn serkêşê gelê me bin, lewre ez bi dilsozî bi we re dibêjim:

Duruşme, belavok, daxuyanî, civîn û hevalbendî bi tenê ê nikaribin serkeftinê bi dest me xîne, Hans Haynz di gotineke xwe de dibêje: "Berî her tiştî, divyaye em dest ji mirov de pêbikin" (Hans haynz: Pevî tevî Corc Lukaç, rû 44), erê, pêwîste em ji mirovê kurd de – çi jin be çi mîr be- dest pê bikin, pêwîste em alîkariyê wî bin, da ku xwe ji kultûra koletiyê û dûvikiyê rêzgar bike, divyaye em geyana kurdayetiye di kesayatiya wî de geş bikin, wê çaxê her tişt ê sererast bibe, û emê di şerê serbixwebûnê de bi serkevin.



# Hoşeng Broka

hoshengbroka@hotmail.com

## AX-NAME



*Ji dostên axê re,  
berî „kasa mirinê“ bi bostekê...*

Dinya, girekî bi qasî Xwedê, mezin e;

bi qasî Xwedê, hebûn û tunebûn;

destpêk û dawî;

reş û sipî;

xweşik û kirêt

û jiyana û mirinê jî.

Dinya gir e;

gir rastî ye;

rastî gurover e.

Dinya, bi qasî Xwedê, ne tenê gir, belê hewqasî girr û kirrê jî.

Jiyana, wekî derewê çargoşe ye.

Mirin, wekî rastiye gurover e.

Jiyana, wekî derewê şêrîn e.

Mirin, wekî rastiye tahl e.

Em, yê ji gir,

çargoşe dibin, lê gurover dimirin;

çargoşe bi hev re dijîn, lê gurover, bi qasî hev, dimirin;

çargoşe gulana ji destên hev diçin, lê gorver, gulana di destên hev de, diçin;

çargoşe diçin serê „gir“, lê gurover sernişîvî binya gir dibin.

Em, yê heta bi gir,

weha ji „ser-gir“ heta bi „bin-gir“ in.

Em, „gir-zade“ ne.. „gir-zade“:

Em, zarûzêçên gir in;

girê heta hetayê ax;

girê bi axê, ji axê, li ser axê, ji bo axê û heta bi axê..

Waaa girê ax!

Waaa girê ax û ax!

Em, „gir-zade“ ne.. „gir-zade“ ...

Em zarokên gir in;

girê bi qasî Xwedê ax;

Xwedayê bi qasî axê ax.

Em zarokên axê ne.. axê:

Carekê ax di be em, yekê jî em di bin ax.

Carekê ax di be ya me, yekê jî em di bin yê axê.  
 Carekê ax „girê“ me ye, yekê jî em „girê“ axê ne.  
 Carekê em girrê axê ne, yekê jî ax girrê me ye.  
 Carekê em kirrê axê ne, yekê jî ax kirrê me ye.  
 Carekê ax şopa me ye, yekê jî em şopa axê ne.  
 Carekê em berê axê ne, yekê jî ax berê me ye.  
 Carekê em pêjna axê ne, yekê jî ax pêjna me ye.  
 Carekê em bejna axê ne, yekê jî ax bejna me ye.  
 Carekê em destên axê ne, yekê jî ax destên me ye.  
 Carekê em dostên axê ne, yekê jî ax dosta me ye.  
 Carekê em hesreta axê ne, yekê jî ax hesreta me ye.  
 Carekê em sirûda axê ne, yekê jî ax sirûda me ye.  
 Carekê em „axa“ axê ne, yekê jî ax „axa“ me ye.  
 Carekê em dînen axê ne, yekê jî ax dîna me ye.  
 Carekê em sebra axê ne, yekê jî ax sebra me ye.  
 Carekê em bihna axê ne, yekê jî ax bihna me ye.  
 Carekê em bextê axê ne, yekê jî ax bextê me ye.  
 Carekê em dewleta axê ne, yekê jî ax dewleta me ye.  
 Carekê em mineta axê ne, yekê jî ax mineta me ye.  
 Carekê em qedera axê ne; yekê jî ax qedera me ye.  
 Carekê em dawiya axê ne, yekê jî ax dawiya me ye.  
 Carekê em rastiya axê ne, yekê jî ax rastiya me ye.  
 Carekê em wateya axê ne, yekê jî ax wateya me ye.  
 Carekê em şahidên axê ne, yekê jî ax şahida me ye.  
 Carekê em pesnê axê ne, yekê jî ax pesnê me ye.  
 Carekê em şensê axê ne, yekê jî ax şensê me ye.  
 Carekê em rengê axê ne, yekê jî ax rengê me ye.  
 Carekê em zimanê axê ne, yekê jî ax zimanê me ye.  
 Carekê em havênê axê ne, yekê jî ax havênê me ye.  
 Carekê em mêvanên axê ne, yekê jî ax mêvana me ye.  
 Carekê em bîra axê ne, yekê jî ax bîra me ye.  
 Carekê em dîroka axê ne, yekê jî ax dîroka me.  
 Carekê em çîroka axê ne, yekê jî ax çîroka me ye.

Em,

„ax-zade“ ne.. „ax-zade“:

Çargoşe ji axê tîn, gurover diçin axê.

Çargoşe, ji axê dibin, gurover dibin ax.

Çargoşe, ji axê bazdidin, gurover bazdidin axê.

Çargoşe, gunehê axê hildidin, gurover di bin gunehê axê.

Çargoşe li ser destên axê dijîn, gurover, ax û ax di mirin.

## BAJARÊN XWE NAS BIKE

# ZAXO JI NÊZ VE NAS BIKE

Zaxo, yek ji qezayên Herêma Kurdistanê ye û dihête hijmartin yek ji dergehên welatî bû derveyî cîhanê. Navenda qezayê bajêrê Zaxo ye, ku dikeve başur-xoravayê deşta Sindiya ya navdar bi axa xwe ya bi bereket. Zaxo bajêrêkî cuwan e, bi ava xwe ya zelal û hewayê xweş dihêt nas kirin. Ava Xabûrî di nîva bajêrî de diburir, di nav bajarî de dibite du çek, û bajêrî dikit du qet û hinek ji bajêrî weke giravekê di nav xwe de digire. Li ser rûbarê Xabûrî, ji aliyê xorhelatê ve pirek ji keviran hatiye avakirin, ku dibêjinê Pira Delal, tê texmînkirin ku li ser demê Mîrgeha Behdînan hatiye nijandin, welê dîrokzan dîroka avakirina wê pirê vedigerînin bû serdemên kevnar.

Mêjûvan pêk ne hatîne li ser dîroka navê bajarî, gelek gotin li ser vê meselê hene, di hindê kitêbên aramiyan de navê bajarî hatiye gotin û dibêjin ya qetbiye ji tîpa *Zaxota* ew a ramana "serkevtin" didît ew hizir dikin ko ev nave ji şerek navbera romî û farisan li dorê vê deverê çêbibû û bi serkeftina Roma bi dawî hatibû, ji ber vê çende navê vê deverê bûye *Zaxota'* yan *Serkeftin*.

Di gotinekî din de, dibêjin navê Zaxo ji tîpa kurdî *Zê-XûN* yan "Xabûrê Xûnê" hatiye, dibêjin ko ev nave jî, ji şerek li deverê qewmî bû û di wî şerî de gelek xûn hatbû riştin. Ev gotine nîzîktir e bû gotina yekem û çêdibe ew şerê di navbera romî û farisan de bit. Gotina siyê dibêjit, ko navê Zaxo ji vê tîpê hatiye *Zê* yan *Xabûr* û *Xowek* yan ew devera wek nihala ne û av lê disekine. Herçewa bit navê Zaxo li gelek stiran û qesîdên kevin de hatiye vegotin, bû nimûne *Zaxoka Delal*.



Dîroka bajêrî bi duristî ne hatîye danan, belê Mîr Celadet Bedirxan dibêje ku bajêrê Zaxo bajêrêkî giring bû li ser demê kutiyên, ya giring ew e ko sabitekî yewnanî Zînfon li sala 104 berî zayînê di bajêrî re buriye wekî ew zivirî bû welatê xwe û wî behsê Xelkê deverê kiriye

Bajarê Zaxo hatîye berfireh kirin li wî cihê ew cihê bajêrê Hisênîya lê, ew a behsê wê li gelek kitêban de hatiye kirin û ereban navê Xabûrî kirbûn Xabûrê Hisênîya û heta nihe taxek bi navê Hisênîkê heye.



Dîrokzanê kurd Bedirxanê Bidlîsî gotîye, ku bajêrê Zaxo digehite Mîrgeha Behdînan li ser demê Mîr Hesên Beg Korê Mîr Seyfedîn û yekemîn mîr li ser hatîye danan ji layê wan ve li sala 98h. Yek ji wan kinseyekî cihûyan li Zaxoyê ava kiribû û niha şûnwarên wê diyar in.

Karê xelkê bajarî li ser çandinê ye bi taybetî jî çandina zivistanê wekî ceh, genim, noka, baqil û fêqiyên rengareng. Herwesa çandina havînê wek bacan, birinc û tûtin û hemî curên keskatiyê. Devera Zaxo bi nav û deng e bi darên spîndaran, gûzan û hinaran. Egera vê çendê ew e, ku Zaxo avekî zelal, û axekî ter û bi bereket heye.

Wek me gotî ku Zaxo dergehêkî giring e bû derveyî cîhanê, ji ber vê çendê bûye melbendenkî giring yê bazirganî, gelek gencên bajarî bûne tacir herwesa gelek kompaniyên tîcarî lê hatine danan.

### Şûnwarên dîrokî yên Zaxoyê

Li Zaxoyê gelek şûnwarên dîrokî hene, rêveberiya şûnwaran li Duhokê dorê 51 cihên şûnwarî li Zaxoyê nivîsîne, yê giring ev in:

#### Kelheya Zaxoyê

Kelha Zaxoyê dikevit li nîva bajarî li layê xoravayê Xabûrî û heta niha ya li ber çav e. Li ser demê Mîrxaneya Behdînan, di demê Mîr Elî Xan de, ew kelhe hate nû kirin û berfireh kirin. Ev kelhe li ser kel û pelên kelhek ji wê kevintir hatiye avakirin û bi berên mezin hatiye avakirin û heta nihe li ber çav e.



#### Kelheya Zaxoyê

#### Kelheya Qubad Paşa

Kelha Qubad Paşa, ew qube dikevit di Mezarxaneya Zaxoyê de, ew qube şeş kojî ye û şeş pencer hene û dergehêk ji fixarî hatiye avakirin û çend nexşek li ser dîwarên wê hene.

#### Şûnwarên Kêste

Şûnwarên Kêste bajêrêk gelek kevin e, mêjûya wê diçe ser demê aşûriyan û gelek kel û pelên aşûrî û yewnanî û îslamî têde hatine dîtin. Herwesa rehmetî Şemdîn li ser şûnwarên Kêste nivîsîye li govara al-Exaa li nîsana sala 1933'an. Bajêrê Zaxoyê dorê 58 km ji melbendê parêzgehê dûr dikevit û pehnatiya wê 8731 km û sê deverên giring hene:

#### Devera Rizgarî

Devera Rizgarî navenda wê Îbrahîm Xelîl e, wekî dergehê bajêrî dihête hijmartin bû derveyî cîhanê. Li wê derê rêka navneteweyî ya cîhanî bo Tirkiye diburir. Navenda wê dikevit wî cihê ku Xabûr û Hîzil digehin yek û li wê derê Pira Cihanî navbera Kurdistan û Tirkiyeyê de heyî.

Navê wê ji mezarê wê hatiye ew a tirba Îbrahîm Xelîl Pêxember û herwesa dihête hijmartin yek ji havîngehên bajarê Zaxo taybetî û parêzgeha Duhokê bi giştî.

Karê xelkê wê deverê li ser çandinê ye, bi taybetî çandina zivistanê wekî ceh, genim, nok, nîsk û hwd. Herwesa çandina havînê wek bacan û birinc û hemî corên sebzî. Ev devere bi nav û deng e bi bîstanan bi taybetî li gunde Lêhfê bîstanên xox, sêv û zeytûnan yê heyîn. Herwesa bîstanên hinar û hirmîkan yê lê heyîn.

#### Çiyayên devera Zaxoyê

Çiyayên giring li deverê ev in:

#### Çiyayê Spî

Çiyayê Spî yê ji başurê devera Doskiya dihêt û berev rojava diçit û dikevite li başurê deverê. Herweha cada cîhanî di wir de diburir bû Zaxo li Geliyê Spî yan jî geliyê Zaxo. Ew zincîreyê dikevit li xoravayê cadê dibêjinê; Dijwar heta Zûrên dikevin hindavî Pêşabîrî li sinorê sê kojî yê sinoran.

Li vê deverê gelek şûnwarên kevin lê hene

û heta niha dorê cihên lê nivîsîn, yê girîng eve ne: Kelha Ermiştê, şûnwarên Dêrebînê, Pêşabîrê, şûnwarên Bêtasê, şûnwarên Dornexê û şûnwarên Brahmî Xelîl.

### Çiyayê Xamtûr

Çiyayê Xamtûr dikeve bakurê deşta Sindiya û bajêrê Zaxo. Ev çiyayê dikeve nêzîk hêla tuxûbê bakur û yek ji bilindtirîn çiyayên vê deverê ye.

### Geliyê Hefttenînê

Geliyê Hefttenînê ku dikeve xorhelatê zincîreyê çiyayê Xamtûrî û her beşeke ji wî çiyayî.

Pehnatiya wê dorê 59 km û hijmara gundên wê dorê 34 gunda ne, hemî hatine xirabkirin. Belê ji layê Hikûmeta Kurdistanê ve careke dî gundên deverê hatine avakirin.

### Devera Sindiya

Devera Sindiya dikevit bakur-rojhelata bajêrî, berî niha ev devere li gel devera Gulîya yek bû û navê wê devera Sindî-Gulîya bû û navenda wê gundê Bêrsivê bû. Belê li sala 1934'an de hatine ji hev vekirin û melbendê wê bû gundê Şeranişê, ya dikevit di nîva devera Sindiya û piştî hîngê melbendê wê bû gundê Derkarê.

### Çiyayê Şikêr

Em di şên erdê deverê bikin du qet û çiyayê Şikêr e, ku dikeve di nevbera herdu qetan. Ew qeta dikevit aliyê bakur gelek çiya, zûr û nihâl lê hene herwesa gele kanî û rûbarok wên lê heyîn wekî:

Şeraniş - Stevlan -Bihêrê- Perex - Behnûne - Qesrok û Hîzil, Kelok- Marsîs - Sindî û Hîzil.

Qetê duwê jî devera deşta Sindiyan, ya bajêrê Zaxo ji aliyê başur ve dikevitê û cadeyek ber bi xorhelatê ve di nav deştê re ji Zaxo diçe bo bajêrokê Batûfa û hevraztir diçe bo nav Berwariya.

Deşta Sindiya bi bîstanên xwe yê xox, sêv, hirmîk û hinar bi nav û deng e. Herwesa bi genimê xwe û heywanên xwe namdar e. Li aliyên bakurê deverê gelek havîngêhên xweş hene taybetî li Şeranişê û çiyayên deverê Nixamtîne ji dar û dirextî, bi taybetî li Şeranişê û geliyê Pisaxa û rêkên Sindiyan. Giringtirîn çiyayên wê, Şikêrre, Hefttenîn, Deriyê Dawetiyân, Hişkal, Serkê Reşûnê, Siwara Stewrê û Xamtûr in.

Gelek şûnwarên kevin li deverê hene û heta niha dorê 84 ciha li rêveberiya şûnwara li Duhokê yê nivîsîne û yê girîng eve ne:

Pira Rebenka Bîşok, pira Şêx Êsiv, kelhên Sinahtê, kelhên geliyê Perexê, kelha Selmanê Sindî û şikefta Stevlanê, Bihêrê û hwd.

Pehnatiya wê dorê 135 km û hijmara gundên wê dorê 98 gunda ne, hemî hatine xirabkirin. Li devera Sindiya gelek komelegêhên Qesrî hatine avakirin weki Derkar, Bandro, Hîzava, Bêrsivê û gundê Darhozanê.

### Devera Gulîya

Navenda wê Batûfa yan Batîfa ye, dikevit aliyê Bakur-Rojhelata Zaxo. Yekemîn car, li sal a 1924 melbendê wê deverê gundê Dêmka bû, dûv de bû gundê Behnûna Gulîya, û li vê dawiyê jî bû gundê Batûfa, ya dikevit ser cada navbera melbendê bajêrê Zaxo û devera Berwarî Bala. Navê Batûfan raman a hindê didit, ku pir bi ba û barovên zivistanê li serde dihên.

Em dişên vê deverê jî bikin du qet, qetek di kevit ser sinorê devera Sindiya heta Xabûrî, qetê Dûwê û yê bakur ji vê deverê çiyayî ye, gelek çiyayên bilind û gelek zûr û nihâl yê lê heyîn û dîsa gelek Kahnî û rûbarok wên heyîn. Ev devere zengîne bi derametê xwe yê zivistanê û havînê û herwesa bi hewayê xwe yê xweşik bi nav û deng e.

Giringtirîn çiyayên wê deverê ev in: çiyayê Nizor ê, Rûs ê, Keşan, Serkê şînî, Behnûne û şabanî.

Giringtirîn rûbarokên wê ev in: royê Zirêzê û Banikê.


Şûnwarên Kevin yêd heyîn û heta niha dorê 51 cihan yêd hatîn nivîsîn, yê girîng ev in: Kelha şabanîyê, Kelha Keşanê, Kelha Bicwanî, Pira Nizdorê û şûnwarên Krît û Bêgova. Pehnatiya wê dorê 80 km û hijmara gundên wê dorê 47 gundane, hemî hatine xirabkirin.

### Cihên Guzarî

Navdartirîn cihên seyran û dîtîne li Zaxo Pira Delal e ku herwiha bi navê *Pira Berî* jî dihêt nasîn.



### Sûlava Şeranişê ya Zaxoyê



### Pira Delal a Zaxoyê



### Çemê Xabûr li bajarê Zaxo

#### Hunermendên Zaxoyê

Zaxo di warê çandeyî û kulturî û Siyasetê de bajarekî girîng e di Kurdistanê de.

Stranbêjên navdar yê Zaxoyê: Hesenê Cizîrî, Erdewan Zaxoyî, Eyaz Yusiv, Ebdilqehar Zaxoi, Awaz Xabûrî, Sileman Guli, Ebdilwahid Zaxoyî, Îslam Zaxoyî, Selam Zaxoyî, Dişad Zaxoyî, Hacî Zaxoyî, Semir Zaxoyî, Idris Zaxoyî, Cutîyar Zaxoyî, Sebah Zaxoyî, Bişar Zaxoyî, Pilo Zaxoyî, Heval Ibrahim, Mohammed Selevanay.

Wekî din Mihemed Arif Cizîrî û Tehsîn Taha û Eyşe Şan ji gelek ji jiyana xwe li Zaxoyê borandine.

#### Çend Navdarên Zaxoyê

Salih Yusivî, Hazim Beg, Seîd Boselî, Salih Musa Boseli, Naîf Boselî, Mehmud Halo, Bedirxan Sindî, Selah Seedella, Hacib Sindî, Dr Mihemed Îhsan, Fetah Gulî, Elî Halo, Isê Swar, Sadiqe Emeri, Ismail Seifadin, Aliqado, Izadin Saado, Mohammed Mirza.

Helbestvanê herî navdar yê Zaxoyê Bedirxan Sindî ye. Helbesta wî "Ey Felek" hunermendên Kurd Mihemed Şêxoyî û Şivan Perwer kirine stran.

Nivîskarên naskirî yê Zaxoyê danerê Ferhenga Selahedîn Selah Seedella, û wergêr û sernivîserê genc yê Kovara Mehname , Husein Muhammed in.

Helbestvanê herî navdar yê Zaxoyê Naîf Boselî ye. Helbesta wî "Wenekin lawê kurd dujmin hêlîna Çekin" hunermenden kurd Erdewan Zaxoyî, kire stran u hindekên din "Nave Pertuka Wîya Helbestan" jiderdên Awarebonê ye.

**Jêder: Wikipedia kurdî**

**Lokman Polat**

# SEROKWEZÎR, ZERDUŞ Û AVESTA

*Berî her tiştî di ramanê de du cewher afirîne ku cewê ne*

*Yek rindî ye, ya din jî xirabî, hem di raman hem di axaftinê de*

*Kesê zane rindiyê heldibijêre di kar, raman û gotinê de.*

*Raman baş bê fikrandin*

*Gotin baş bê gotin*

*Kar baş bê kirin*

**Zerduş Spîtama**



Serokwezîrê komara Tirkîyê R. T. Erdogan kurdan û hêza siyasî û rêxistinî a kurd bi şeytanperestiyê suçdar dike û dibêje; "Ew Zerduşî ne, bi şeytan digrin, wek pêxemberê xwe Zerduş qebûl dikin. Şeytanperest in." Û li gor meşreba xwe rexne digre. Serokwezîr jî û gelê tirk jî ji bo zanîna ola Zerduşiyê nezanin. Ew nizanin ev ol çiyê? Berevajê ku R. T. Erdogan dibêje, Zerduşî bi Şeytan nagrin. Di pirtûka ola Zerduşiyê "Avesta" yê de dijîtiya Şeytan heye.

Hinek qanalên televîzyonên tirkîyan yê nê olperest û qanala TRT-6 herweke ku bi kurdan ola Îslamê bidine nasîn weşan dikin. Tu dibêjî qey kurd misilman nînin yan jî bi misilmaniyê nizanin û ew jî wan fêrê misilmantiyê dikin. Di hêla zanîna Îslamî de tiştên ku kurd jî tirkîyan fêr bibin tune. Hemû Şêx û Ewliyayên ola Îslamê yê Anadolîyê û bakurê Kurdistanê kurd in.

Yên ku tirkîyan kirin misilman kurd in. Yê ku ola Îslamê hetanî Endonezyayê birin û belav kirin kurd in. Yê ku ola Îslamê li hemberê êrişên Xaçperestan parastin û nehêştin ku têk biçê kurd bûn. Li cîhanê Sultanê herî navdar ê Ola Îslamê Sultan Selhaddîne Eyyubî kurd e. Tirkîyan di asya navîn de agirperestbûn, bi xurafeyên tewş bawer dikirin. Navê ola wan jî Şamanî bû. Şamanîzm ola tirkîyan a beriya îslamîyê buye. Şamanîzm di bingeha xwe de sihêrbaziyê.

Damezrevanê wê tune û pirtûka wê jî tune. Keşeyên Şamanîst porên xwe dirêj kirine û fistanê jinan ê dirêj li xwe kirine û lotikan avêtine, dans kirine. Bawerîya Şamanîstan jî baweriyêke tewş bûye. Wan bi ruh, bi ruhên di nav xwezayê -tebîet, natur- de hene bawer kirine. Hinek tatar, hinek tirkîyan ku li Asyayê mane û hinek tirkîyan ku li Kazakîstanê, Kirgîstanê û Kafkasyayê mane hêj jî Şamanîst in. Tirkîyan ku hatin di Kurdistanê de derbasê Anadolîyê bun, kurdan ew kirin misilman.

Şamanîzm, ango Şamanîstî oleke tewş û bêmane bû. Piştî ku tirkîyan jî asya navîn ji ber xela û birçîbûnê koç kirin û hatin Kurdistanê û Anadolîyê, kurdan ew kirin misilman û nan, xwarin dan wan û ji wan re rê vekirin ku biçine rojavayê Anadolîyê. Ew bi xêra kurdan re derbas bûn û çûn li ser axa Bîzansiyên romî bi cih û war bûn.

Min heta ku pirtûka pîroz a ola Zerduş (Zarahustra) Avestayê nexwend, min digot qey ola Zerduşî û ola Êzîdî eynê ne, ango heman tişt in. Lê piştê ku min Avestayê xwend, min dît ku di nav herdu olan de, di hinek waran de bîr û baweriyên cuda hene.

Ev cudahîbûn di pîrsa Şeytan de xwe derdixê holê. Wek tê zanîn Şeytan di ola Êzîdîyan de ciheke grîng digre û Êzîdî li dijê Şeytan nîn in.

Lê di Avestayê de dijîtiya Şeytan heye. Pêşevayê ola Êzîdîyan Sêx Hadî (hinek jê re dibêjin Sêx Adî.

Peyva "Adî" di Erebi de bi maneya tiştên normal e, lê di zimanê tirkî de bi maneya tiştên ne normal, tiştên xirab e.) bi navê "Mishefa Reş" pirtûkeke nivîsiye û di ola Êzîdîyatiyê de guhertin çêkiriye û navekî nûh, navê Êzîdîtî bi kar aniyê. Loma jî ji wan re dibêjin; "Ola Êzîdîyan".

Nivîskar Receb Dildar dibêje ku; "Ola Êzîdîyan beriya Zerduşiyê jî hebûye û wek kok digîşe Mîtraîzmê. Di ola Êzîdîyan de pêxember tune ye." Hinek jî berevajê vê dibêjin û li gor wan ola Êzîdî jî nav ola Zerduşiyê derketiye. Ango ola Zerduşî beriya ola Êzîdîyan hebûye. Di Zerduşiyê de Pêxember heye û Zerduş bi xwe wek Pêxember hatiye binavkirin. Ola Zerduşiyê di dema împaratoriya Sasaniyan de oleke fermî a dewletê bûye.

Ev herdu ol, ola Êzîdîyan û ya Zerduşiyê di hinek waran de herçiqas jî hevûdu cuda bin jî di gelek waran de wekhev in. Herdu ol jî bi giranî di nav civata kurd de bela bûne û yê ku bi van herdu olan bawer dikin bi pîranî kurd in. Ji xwe jî boyê ola Zerduşî têt gotin ku; ev ol ola herî kevn ya kurdan e. Ola Zerduşî ne tenê di nav kurdan de, herweha di nav gelên Îranî û heta Hîndîstanê belav bûye. Di eyaletê Hîndîstanê ya bi navê "Wezîrîstan"ê de ev ol hêj jî têt parastin û herweha yê ku bi vê olê digrin, pêbawer dikin, diparêzên bi milyonan însanên Wezîrîstanê ne. Hinek hemwelatîyên bineciyan Wezîrîstanê bi esl û koka xwe jî kurd in.

Li gorî dîroknasan, Zerduş hîmdarê yekemîn yê ola gelê Aryan bûye ku Aryan jî bapîrên kurdan bûne. Di dema qedîm de, beriya zayîna Îsa, di nabeyna salên 1000 - 1500î de ola Zerduş gelek bi hêz - bi qûwet- bûye. Di wê demê de ola Zerduş bûye ola fermî ya împaratoriya Sasaniyan.

Avesta navê pirtûka pîroz ya ola Zerduşî ye. Avesta tê maneya îzanîna bingehînî. Metnên Avestayê li ser 12000 çermên gayan hatiye nivîsîn. Împeratorê Meqedonyayê Îskenderê mezin wexta ku sefer kiriye û çûye avêtiye ser welatê Aryan 17 cildên Avestayê bi dest xistiye û sewitandîye. Di wê demê de hinek Zerduşî ji wir reviyane û çûne Hîndîstanê. Ew wexta ku çûne metnên nivîsînên Avestayê jî bi xwe re birine wir, wan hinek beşên Avestayê ji talana dagirkerên Makedonîyan xilas kirine. Ev metnên Avestayê yê ku ji ber talanê û sewatê xilas bûne, di sedsala 17ê de ji alî yekî Fransî - Anguetîl Duperon- ve hatiye wergerandin û weşandin.

Zimanê ku Avesta pê hatiye nivîsîn gelek nêzikê zaravayê kurdî -zazakî- ye. Tê gotin ku, mirovê ku bas zazakî zanibe, wexta metna orîjînal ya Avestayê bixwîne jê fêhm dike.

Di Avestayê da navê xwuda "Haoma -Xoma-î" ye. Ev nav bi tenê ji alî Zazaaxifan ve hêj jî ji bo Xwuda/Xwedê tê bi nav kirin.

Ola Zerduşî û pirtûka wî ya pîroz Avesta ji alî dîtin û ramanên felsefîk ve gelek dewlemend e. Başî û xirabî, ronahî û tarîfî ji alî ola Zerduş ve wek dîtin û ramanên felsefî hatiye pêskêskirin. Beriya ola Zerduşî de, di nav civata Aryan de ola Mazdaîzm hebûye. Zerduş gelek aliyên wê olê guhertiye, tede gelek reforman çêkiriye û dualîtiya -dualîzm- bawerîya xwe wek sîstemeke qihîm xistiye nav wê.

Di derbarê jiyana Zerduş de agahiyên gelek kêmhene. Di derheqê bîyografîya wî de zanînen rasterast tune ne. Di îlahîyên Gatha de hinek agahdarî hene, lê ew jî têt nake. Li gorî çavkanîyên dîrokî, têt gotin ku Zerduş di dema nabeyna 600 û 1000 a beriya mîladê de jiyaye. Ew bi xwe mirovekî ruhanî bûye. Zerduş di 30 saliya xwe de dest bi kar û xebata xwe ya belavkirina ola xwe dike. Pêşî ji nav qebîle û esîra wî li hember wî reaksiyonên mezin çêdibin, hemû kes li dijê wî derdikevin. Yê ku li dijê wî derdikevin, dixwazin ku Zerduş ji wir koç bike û biçê. Lê paşê Zerduş ola xwe bi gelek kesan dide qebûlkirin. Yê pêşîn ku ola wî qebûl dike xezûrê wî ye. Zerduş pistê kar û xebateke deh salan ola xwe bi kral anku împarator Vîspastas dide qebûlkirin. Û bi vê hawayî ola Zerduş bi berfirehî belav dibe, ji alî gelekên têt qebûlkirin. Zerduş li bajarê Medan, di Ragayê de jiyana xwe didomîne. Di nav Medan de bîr û baweriyên ola wî belav dibe, bi hêz dibe û ber bi alî rojava ve belav dibe.

Di ola Zerduşî de sê tîstên bingehîn hene, ew jî; 1 - Monoteîzm e, 2 - Dualîzm e, 3 - Eskatologî ye. Monoteîzm bi maneya yek xwedan e, Dualîzm bi maneya dualîtiyê ye, Eskatologî jî bi maneya axîretê ye. Di ola Zerduşî de navê xwedanê herî mezin Ahura Mazda ye. Ahura Mazda damezrevan û xwedayê sazûmana adil e. Hem di ola Zerduşî de û hem jî di ola Yezîdîyan de Roj pîroz e. Agir jî pîroz e. Agir temsîliya Rojê ya li ser erdê dike. Agir her pêxistîye, venamire. Êzîdî û Zerduşî wexta ku dua dikin berê xwe didine Rojê û dua dikin. Ola Zerduşî ola paqîjîyê ye, ola kar û xebatê ye, ola li dij xirabiyê ye.

Piştê van kurtegotinên li ser ola Zerdûsî, ez dixwazin naveroka pirtûka pîroz "Avesta" yê bi kurtahî bidim danasîne. Avesta ji alî Zerduş ve bi zimanê nêzikî zazakî hatiye nivîsîn. Paşê hinekan wergerandine zimanê pehlevî -farisî-, Nathan Sîderblomê ..... **Berdwam(21)**

# XELÎL XEYALÎ MOTKÎ

## kî bû?

### 1. Jiyana Xelîl Xeyalî

Xelîl Xeyalî (1876-1926 ji Modkê ye, ji qebîleya "Mûdan" e. Li cem Se'îdê Nûrsî (1876-1960) ders girtiye û gelek di bin bandora wî da maye.

Di dawîya sedsala 19an de çûye Stenbolê û li wê derê li ser xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî xebat kiriye.

Di sala 1908an de li Stenbolê di damezirandina komeleyên bi navên Kurd Te'avun û Teraqî û Kurd Neşrê Me'arif de cih girtiye. Ji bo perwerdekirina zarokên kurdan bi zimanê kurdî, di sala 1910an de ji aliyê komeleya Kurd Neşrê Me'arif ve li Çemberlîtaşê yekemîn dibistana kurdî bi navê Kurd Nimûne İbtidâîsi-Meşrutiyet hatiye vekirin. Xelîl Xeyalî di vekirina vê dibistanê de rolek mezin listiye.

Di vê dibistanê de li gor elfabeya wî ya ku emê jê behs bikin perwerde bi zimanê kurdî hatiye kirin. Di sala 1912an de li Stenbolê ji aliyê hinek xwendevanên kurd ve Komeleya Hêvî hatiye damezirandin û heta Şerê Cîhanê yê Yekem dewam kiriye.

Xelîl Xeyalî di damezirandina vê komeleyê de jî rolek girîng leyistiye. [1] Armanca herî girîng ya vê komeleyê ji bo hêskirina xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî amadekirina elfabeyek kurdî bû.

Xelîl Xeyalî di kovara bi navê *Rojî Kurd* de li ser xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî û sitandartkirina elfabeyek ku ji bo temamê zaravayên kurdî bi kar bê çend gotar nivîsandine. Bo nimûne di hejmarê sisêyan de, di gotara xwe ya bi sernavê *Ziman* de pîrsek wiha kiriye: "Kurd îro muhtacê çi ne? Em ewan bêjin". Paşê jî tiştên ku ihtiyaciya kurdan bi wan heye di 10 madeyan de rêz kiriye.

Di madeyên duyemîn, sêyemîn û heştamîn de wiha gotiye:[2]

2- Ser terzek nû elifbayek.

3- Ji bona temamê zimanê kurdîtiyê qamûsek (ferhengê mezin).

4- Ji bo zimanê kurdan serf û nehwek (rêzimanek). Çawa ku ji madeya duyemîn jî tê fêmkirin jiber ku baweriya Xelîl Xeyalî bi diviyatiya amadekirina elfabeyek standart ya kurdî hebû, di sala 1909an de li Stenbolê yekemîn alfabe ya kurdî ya bi tîpên erebî çê kiriye û navê wê danîye "*Elifbeyê Kurmancî*".

Bi saya du şexsiyetên kurd der barê Xelîl Xeyalî de bi kurtasî be jî hinek agahî gihastine roja me. Yek ji van şexsiyetan Se'îdê Nûrsî ye, yê din Qedrî Cemîl Paşa ye.

Se'îdê Nûrsî (Kurdî) der barê Xelîl Xeyalî û elfabeya wî de wiha dibêje:

"Ez mînakek neteweperwerî ji we re pêşkêş dikim ku ew jî Xelîl Xeyalî Motkî ye. Mîna her beşek mîletperweriyê di beşa ziman de jî xelata pêşbaziyê a wî ye. Wî alfabe û serf û nehv(rêziman)a ku bingehê zimanê me ye çêkiriye. Vî zatê han nimûneyek mîletperweriyê nîşan daye û ji bo zimanê me yê ku mihtacê temamkirinê ye bingehêk daniye. Ez ji ehlê hemiyetê (ji mîletperweran) re tewsiye dikim ku, li pey rêça wî herin û zimanê me li ser wê bingehê ava bikin".[3] Ekrem Cemîl Paşa jî wiha dibêje:

Li gor Ekrem Cemîl Paşa, Xelîl Xeyalî û Ziya Efendi (Ziya Gokalp) bi hev re rêzimana kurdî amade kirine û dest pê kirine ku ferhengê jî binivîsin.

Lê Ziya Gokalp ji xwendinê tê derxistin û gava tê Diyarbekir xebatên ku wî û Xelîl Xeyalî bi hev re kiribûn jî bi xwe re tîne û ji wê û pê ve tîkiliyên wî û Xelîl Xeyalî tîne birîn. Piştî meşrutiyetê dema ku Ziya Gokalp wekî delegeyê Diyarbekrê beşdarê "Komeleya İttîhad û Teraqî"yê ya li Selanîkê dibe û Xelîl Xeyalî li Stenbolê dibîne. Xelîl Xeyalî ew xebatên ku bi hev re kiribûn jê dixwaze, lê dibêje "min ew şewitandin" û naxwaze ku bide Xelîl Xeyalî.[4]

### 2. Alfabe ya Xelîl Xeyalî

Çawa ku ji gotinên Se'îdê Nûrsî tê fêmkirin wekî niha di wê demê de jî rewşên birîn kurdan ji bo sitandartkirina zimanê kurdî li ser alfabekek sitandart nîqaş kirine. Di nîqaşên di vî warî de Se'îdê Nûrsî xwestiye ku alfabe ya Xelîl Xeyalî wekî bingehê qebûl kirin. Nexwe di nîqaşên îro de jî divê ev alfabe neyê jibîrkirin, beranberiya wê bi alfabe yê din bê kirin, kêmahî û zêdehiyên wê bînin û jê were îstifadekirin. Loma di vê nivîsa xwe de me xwest ku em vî alfabe yê jî bi çend gotinan bidin naskirin:

1) Alfabe ya Xelîl Xeyalî yekemîn alfabe ya kurdî bi tîpên erebî ye.

2) Ev alfabe bi hemançapî di pirtûka Mehmet BAYRAK ya bi navê "*Açık-Gizli, Resmi-Gayr-ı Resmi Kürdoloji Belgeleri*" de hatiye weşandin.[5]

3) Hogir Tahir Tewfîq di xebata xwe ya bi navê "*el-Elifbau'l-Kurdiyye Bi'l-Hurûfî'l-Erebiyye We'l-Hurûfî'l-Latîniyye*" (*Elfabeyên Kurdî yê Bi Tîpên Erebi û Latîni*) de li gor çapa Mehmet Bayrak alfabe ya Xelîl Xeyalî jî qeyd kiriye.[6]

4) Alfabe ji aliyê weşanxana "Hîvda" jî bi tîpên erebî hatiye weşandin.[7] Lê tê de hinek guhartin û şaşî hene.

5) Alfabe ji 34 tîpan pêk tê. Ev tîp digel Latîniya wan ev in:

|      |      |      |      |      |      |      |
|------|------|------|------|------|------|------|
| =Ab  | ب=Bb | پ=Pp | ت=Tt | س=Ss | ج=Cc | ç=Cç |
| ح=Hh | خ=Xx | د=Dd | ز=Zz | ر=Rr | ن=Nn | ج=Jj |
| س=Ss | ش=Şş | ص=Ss | ض=Dd | ط=Tt | ظ=Zz | ع='  |
| غ=Gğ | ف=Ff | ف=Vv | ق=Qq | ك=Kk | گ=Gg | ل=Ll |
| م=Mm | ن=Nn | و=Ww | ه=Hh | ا=La | ي=Yy |      |

6) Alfabe digel mînak û agahiyên cûrbecûr ji 27 rûpelan pêk tê. Naveroka rûpelan wiha ye:

a) Rûpela yekemîn qapax e. Tê de navê xebatê (*Elifbayê Kurdî*), navê nivîskar (Xelîl Xeyalî Motkî), navê çapkiro (Kurdîzade Ehmed Ramîz) û sala çapê (1325) cih digire.

b) Di rûpela duyemîn de 34 tîpên alfabe yê hatine nivîsandin ku me van tîpan digel Latîniya wan li jor da nîşandan.

c) Di rûpelên sêyemîn, çaremîn û pêncemîn de navê wan tîpan û rewşa nivîsandina wan di ser û nav û dawîya bêjeyê de hatiye nîşandan.

d) Di rûpela şeşemîn û heftemîn de li ser rewşa dirêjkirina tîpan, tîpên bênuqte, tîpên biyeknuqte, tîpên bidunuqte û tîpên bisênuqte hatiye sekinandin.

e) Nivîskar di rûpela heştamîn de li ser bilêvkirina tîpan li gor *ser* û *cer* û *ber* yê erebî ku ji wan re "hereke" tê gotin sekiniye. Mînak: *Be, bi, bu; te, ti, tu.*

f) Di rûpela nehêman de nivîskar behsa "tenwîn" a erebî kiriye û bal kişandiye ku di zimanê kurdî de tenwîn nîne. Çawa ku tê zanîn tenwîn di dawîya navdêrên erebî de cih digire û wekî du seran, du

beran an jî du ceran ("..en", "..in", "..un") tê bilêvkirin. Ji bo nimûne tîpa ب=Byê gava di dawîya navdêrek erebî de cih bigire wiha tê xwendin: *Ben, bin, bun.* Di rûpelên di pey re mînakên cûrbecûr cih girtine.

g) Di rûpelên 23 û 24an de di bin sernavê "*Îbare*" de nivîskar bi şiklê şêrê hinek nesîhet kirine. Mînak: *Ders bixwune, zimanê Kurmancî hûbe.*

h) Nivîskar di rûpelên 24, 25 û 26an de hinek du'ayên erebî nivîsandine.

i) Di rûpela dawîn de di bin sernavê "*Rica*" de wiha hatiye nivîsandin:

"Behayê vê (elfabeyê) ji bo tebi'kirina (çapkirina) kutubê (pirtûkên) Kurmacan e. Li pey vê, qiraet (xwendin) û serf (morfoloji=peyvsazî) û nehv (rêziman)a zimanê Kurmancî jî dê tebi' bibe (were çapkirin). Feqet em muhtacê arîkirinê ne. Bê arîkirin tiştik nabe. Hêviya me xeyret û cuwamêriya Kurmacan e. Meqседа me ji zarokê Kurmacan ra nîşandana rêya 'ilm û hunerê ye'.

7) Tiştêk balkêş jî ev e ku Xelîl Xeyalî bêjeya "Kurmanc" wekî "Kurmac" bi kar anî ye. Ango cih nedaye tîpa "n"yê. Berê me got qey viya kêmasiyeke çapî ye. Lê me dît ku Cemal Reşîd Ehmed di kitêba xwe ya bi navê "*Zuhûru'l-Kurd Fî't-Tarîx*" de dibêje ku di dema Mîrektiya Erdelan de Mîrê kurd yê bi navê Xusrev b. Muhemmed di destnivîsek xwe de bêjeya "Kurmanc" wekî "Kurmac" bi kar aniye û ev destnivîsa han di sala 1984an de li Moskovayê hatiye çapkirin.[8] Wê demê me fêmkir ku di nav hinek nivîskarên kurd yê berê de navê "Kurmanc" wekî "Kurmac" jî hatiye xebitandin.

Muherrir (Nivîskar)

Xelîl Xeyalî Motkî

Tabî' (Çapkiro)

Kurdîzade Ehmed Ramîz

Sal

1325

[1] Zinar Silopî, *Mes'eletu Kurdistan (Doza Kurdistan)*, Pêşkêşkiro: Îzedîn Mistefa Resûl, çapa duyemîn, Beyrut, 1997, r.33-35

[2] *Rojî Kurd*, 1913, hejmar:3, r. 21-22 (Amadekar: Cemal Xeznedar).

[3] Se'îdê Nûrsî, *Îki Mektebê Musîbet* (Di nav "Asarê Bedî'îye" de), r.334 -335.

[4] Binêrin Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Silopî), *Doza Kurdistan*, wergerandina bo kurdî: Omer Dewran, Weşanên Bîr, Diyarbekir 2007, r. 24-25.

[5] Mehmet Bayrak, *Açık-Gizli Resmi-Gayr-ı Resmi Kürdoloji Belgeleri*, Enqere, 1994, r.462-505.

[6] Hogir Tahir Tewfîq, *el-Elifbau'l-Kurdiyye Bi'l-Hurûfî'l-Erebiyye We'l-Hurûfî'l-Latîniyye*, çapa yekem, Erbil, 2005. Ji bo agahiyên der barê Xelîl Xeyalî û elfabeya wî di vî kitêbê de binêrin r.23-40.

[7] *Elifbêya Kurdî*, muherrir (nivîskar): Xelîl Xeyalî, Çapxana Hîvda, çapa yekem, Stenbol, 2004.

[8] Cemal Reşîd Ehmed, *Zuhûru'l-Kurd Fî't-Tarîx*: Erbil, I6, 1, 2003

# Ji folklora kurdî

**Danheva: Dilovan çeto**

## Dostaniya rast

Rojekê mîrê bota bang kire wezîrê xwe û jêre got: ti bixwe zanê ez tiştêkî divî welatîde bê şewrate nakim, ji ber ev bû çend sal tu wezîrê min î û min ji rastiyê pêve li dorî te nedîtiye.

Lê îro ezê bite bişewirim ne di derbarî kar û xebata meyî welatîde, lê belê ji bonî daxwazeke min î teybet.

Wezîr got xwedê xêrbikê mîrê min, fermoke bêje ez li te guhdarim.

Mîr got: bi rastî hîn dilê min di dinyayêde heye û ez dixwazim jineke dî ji xwe re bînim, ji ber vê yekê ez dixwazim bite bişewirim ka ez jineke çawa bînim ?

Wezîr got: mîrê min eger tu şewra min dixwazê, bere jineke qehp û diz be !!!!

Dema mîr ev gotin ji wezîrê hiskir, dîn û har bû çavê wî çûne nava serê wî, rabû ser xwe û qilîç \* kişand û xwest serê wezîrê ji gewdê wî jêkê , lê hate bîra wî xizmet û alîkariya wezîrê jêre. Qilîç vegeande cihê wê û jêre got: destê min li te nagerê ez serê te jêkim çawa tu dibê jineke qehp û diz ji xwe re bîne, lê ezê / 24 / se' eta muhletê bidime te, divê tu ji cizîrê barke, lê ez bi aniya mîrkim di peyre ezê serê te jêkim.

Wezîr bawerya xwe anî eger di derbarê /24/ se'eta de ji cizîrê barnekê wê mîr serê wî jêkê. Bilez kar û bara xwe kir û bi tîrêjê rojêre yên pêşî ji axa cizîrê derket û berê xwe da koçberiyê, qedere çend roja meşîn gihane(keliha bûnisra) \*\*, nerîn vaye av heye û dar û şînkayî û dehl û devî û çiyane, gotin ji vir xweştir em nabînin, li wir daketin û wezîrê û pîreka xwe û zarokên wî alîkarî bi hev re kirin û ji kevir û dara xanîkî xwe avakirin.

Çend mehê wan li wir qedan, çî kesê diwê herême ve derbas dibû û wezîrê didî û gotin û zanebûna wî didîtin jêre digotin em dixwazim bibin cîranê te, wilo ta li dora mala wezîrê gundek hate avakirin, û wezîrê bû mezinê wê êlê.

Piştî wezîrê ji cizîra bota barkir û koçber bû, salek dido derbas bûn, serokê eşîra û kesê dijminatîya mîrê dikirin dest dane hev û mîrê ji mîrîti xistin, mîrê tengerzar bû kesek nema hate dîwana wî, nema kesekî lê pîrsî, hin ji tîrsa serokê eşîrê go dijminatîya mîrê dikirin û hinek bixwe ne dilxwazê mîrê bûn ji pêşîve.

Mîrê wê çaxê tilîkê xwe gez kirin û poşmanî xwe da pêş lê nema fêde dikê . mîrê ji xwe re got: min çî mala xwe bi destê xwe xerakir, divê ez li wezîrê bigerim û ez careke dî wî vegeerînim cizîrê, lê eger wezîrê çarekê ji min re nekê ezê wilo bimînim bin destê va zikreşa .

Dem bû êvar mîrê bankire berdestîkê xwe û jê xwest sibehê zû herê li wezîrê bigerê û jê bixwazê vegeerê cizîrê, lê dema bêjê ez venagerim jêre bêje li ser zîmanê min, ez lêborîna xwe jê dixwazim eger tu naxwazê vegeerê cizîrê hinek şîreta li min bike.

Bi tîrêjê rojê yên pêşî xulamê mîrê li hespê siwar bû û ji cizîrê derket û berê xwe da gund û bajarê derdora cizîrê, li vir li wir, xulam dipîrsê ji rêbwarîya ji cotyara ji bazîrgana, û ji berêve dibêjin ( bi pîrsê mirov digihê xursê ). Demeke baş xulam gerîya û pîrsî ta gihîştê gundê wezîrê .

Xulam berê xwe da mala wezîrê, wezîrê û zarokê xwe hatine pêşya wî, çûne lep û riwê hev, bihna cizîrê li pozê wezîrê xist û welatê wî hate bîra wî hêsîrê ziwa ji çavê wî herikîn .



Şîva xwe xwarin, li hal û demê hevdû pîrsîn, û ji xwe re li oda wezîrê rûniştin ta derengî şevê, gundî yeko yeko ji odê derketin çûne malê xwe, mane wezîrê û mêvanê xwe bi tenê .

Xulam berê xwe da wezîrê û got : gelek silavê mîrê ji tere hene û gelekî bêriya te kiriye, xulam ma sekinî û serê xwe tewand !?

Wezîr got serê xwe rake û ji min re bêje çî bûyer qewimîne li cizîrê ?

Xulam keserek berda û got : piştî te ji cizîrê barkir dijminê mîrê xwe dane hev û mîrê ji mîrîti xistin û vaye mîrê ez şiyandime pey te, gelekî poşman bûye û lêborîna xwe ji te dixwazê û dixwazê tu vegeerê cizîrê, lê eger tu nexwazê vegeerê, mîrê dibê ez şîretna jê dixwazim .

Wezîr got : wext dereng bûye çaxê razanê û tu ji rêke dûrve hatiye , here oda xwe raze û sibih xêr pêre tê .

Wezîrê çû nav nivîna xwe , destê xwe xistine bin serê xwe û kûr û dûr fikirî, ramanên wî çûne cizîrê wilo ta dixwazê çû .

Serê sibehê ji xew rabûn wezîrê gote xulam rabe emê herin nav werzê minî go min li binya gund çandiye, emê şebeşekî cemidî bixwin ta bibê dema taştê.

Wezîrê û xulam xwe berdane nava werzê, xulam ji xwe re li werzê meyzand , xwedê avakê her şebeşekî mîna cêrekî tê, carekê ji nişkave wezîrê rahiştê şebeşekî herî mezin di lemê de û li bin guhê erdê xist, her parçekî bi cîkîve çû !!!!

Wisa bi nav lema ket çî şebeşekî mezin dinav lema de dît jêkir û libin guhê erdê xist, bivî rengî wezîrê dinav werzê ve meşî ta gihîştê dawîya werzê, li vegeerê çavê xwe li şebeşê biçûk digêrand û ax dida dora wa û ber lemê wan xweş dikir, dawî şebeşekî jêkir, şikand û qeşart û bankire mêvanê xwe de were kerembike em bixwin !!!!!???

Xulam bixwe matmayî ma û dibê xwede digot : çî bi wezîrê hatiye şebeşê mezin dişikîne û guh didê yê biçûk .

Şebeşê xwe xwarin û vegeerane mal, xanima wezîrê taştê danî ber wan, xulam taştîya xwe xwar û kar û bara xwe kir ji bo vegeerê cizîrê.

Xulam got : vaye ezê vegeerim û ti naxwazê bi min re werê, lê te ne şîretê ne jî qewetiyek li

min kir da ez bigihînim mîr.

Wezîr got : tê gelek silava li mîrê bikê û tiştêkî ku ez ji tere bêjim nîne bi oxira xwe de here xwedê dibê tere bê.

Xulam xatir xwest û berê xwe da axa cizîrê. çavê mîrê bûne stêr li devê riya xulam û wezîrê lê piştî xulamê giha xebere dane mîrê û gotin xulam bi tena xwe hatiye. xulam giha û silav da mîrê lê mîrê li ser agire, rabû ser xwe û got: xwedê xêrkê te wezîrê dît yan na? Û eger te ew dîtibê çima bi te re nehat.

Xulam got : mîrê min min ew dît û silavê wî li te hene lê belê min kir û nekir bi min re nehat. Mîrê jê pîrsî eger ji gotinekê ji şîretêkê, lê xulam got mîrê min ewî tu şîretê jî li min nekirin, mîrê bihnekê rawesta, fikrê ramanê ew birin û anîn, bankire xulam û got : ji min re bêje çî bitere qewimî ji despêka gihîştina te mala wezîrê û ta vegera te axa cizîrê .

Xulam got mîrê min ti bûyer ne qewimîn lê belê tiştêkî tenê bala min kişand , mîrê bilez got ew jî çibû ? .

Xulam ew dîtina li nav werzê ji mîrê re got. mîrê rûnişt û bihneke kûr û dirêj kişand û keserek berda û di peyre serê xwe hejand .

Qederê çend meha derbas bû mîrê dostê û hevalê xwe û gelek mîrê û siwar peyda kirin û ew di zêrê û pera de hiştin .

Rojekê mîrê çû odê û ji serokê eşîrê û kesê mîrîti ketiye destê wan de got: ez bixwe kurê wî welatî me û xelkê cizîrê dostê û bira û mirov û pismamê mene û mezinê cizîrê jî mezinê me tevane û ji bo vê yekê ez dixwazim we mezinê û serokê êlê û eşîran li mala xwe bi civînim û em parîk nan bi hev re bixwin .

Teva ji hev re gotin ev kes perê û baskê wî hatine jêkirin û tu kes li dora wî nema ye , dibê ku ew gihaye baweriyekê nema çare heye ji bilî ew jî destê xwe bixê destê me û ew jî bikeve bin siha mede.

Soz dane mîrê filan rojê em mêvanê tene . Mîrê jî zîlamê xwe amadakirine bi çek û silahê û ji wan re gotiye dema mêvanê tev de derbasbûnê odê winê êrîşê berdine ser wana û yekî tenê ji wan neberdin û serê hemîyan jêkin.

Bû roja soza mîrê û neyarên wî, her axakî her serokê êlekê xulamê xwe bi xwe re anine. hemû derbasbûne odê, rûniştin .

Zîlamê mîrê êrîşê berdane ser wan, serê teva jêkirin.

xwîn herikî sikakan, mîrê ferman da û got: ez mîrê bota me, çî kesê serê xwe li ber min rakê wê serê wî herê nav wan serê jêkirî .

Jiwê rojê ve kesekî newêrbû serê xwe yan xeberekê li ser mîrê bêjê. mîrê vegera mîna berê, odawî, dîwana wî ji xelkê cizîrê nema vala dibû .

Rojekê mîrê bankire xulamê xwe û got : ji min re çend siwara amade bike û tîjî bi wan re û kara xwe bikin emê herin wezîrê vegeerînim cizîrê, ji ber wezîrê min aqil mende û delale û ez qenciya wî û şîreta ku bitere rêkiribû ji bîr nakim.

Xulam matmayî ma û got: mîrê min tiştê ez dizanim wezîrê ti şîret bi min re ne şiyandin û ti qewetî jî li min nekirin ji bo ez bigihînim te !!

Mîrê got : çawa, dema winê çûne nav werzê û ew şebeşê mezin di lema de li erdê dixistin û di pelixandin û şebeşê biçûk ax dida dora wan û ber qurmê lemê wana xweş dikir,..... **Berdwam(12)**



## Hevpeyvîna Pênûsa Nû bi

# Can Kurd re

## Serok û rêberên partiyên ji tirsên kuştinê reviyane başûrê Kurdistanê.

- *tevgera siyasî hîn negihaye asta tevlêbûna gel di serhildanê de.*
- *Bi darê zorê peyman naçin serî.*
- *Hin partî ketine bercewendiya sîstema Esed.*
- *armanca serekî a partiyên ji 'Desteya Bilind' ewe, ku gel bibêje: "Vaye partiyên me tiştêkî dikan."*
- *Qey Esed nedihêst û van „Selefî“ dihêlin?, melbend û baregeh vebin?*
- *Tiştê tev giring ewe, ku 'Pênûsa Nû' serbixwe bimîne, nekeve bin basikên çî hêzan an rêgahên siyasî yên ku wekî rêgahên sofîyan ketine nêv rihên hev.*

**Pênûsa Nû:** Şoreşa gelêrî ya milletên Sûrî ji 15ê adara 2011an ve berdewam e, tu wek nivîskar û rewşenbîrekî kurdên rojava, asta beşdarbûna kurdan di şoreşê de çawa dinirxînî?

**Can kurd:** Gelê kurd herdem leşkerê azadiyê bû, hema tevgera siyasî hîn negihaye asta tevlêbûna gel di serhildanê de. Hinek basikên tevgerê jî - mixabin- ta niha dev ji siyaseta xwe ya „ne-azad“ bernedane, nikanin guhartina dûrokî bipejirînin an binasin. Gelê Kurd bo serhildanê qurbanîyeke mezin daye û dide jî, hema tevger nikane serkêşîya gelê xwe bike. Beşdarbûn di şorişê de, divê ji vê rewşa niha baştir ba. Mirov nikane bibe hembervanê „şorişvanî“ yê sîstemê û di vê demê de azad di Sûriyê de bigere û semînanan li dar xîne, di va rewşa xûnî de siyaseta bike, wekî ku tew serhildana xûnî nîne.

**Pênûsa Nû:** Tu dawîya şoreşê çawa dibînî? Ewê bi çî şeweyî bi dawî bibe? Gelo kurd di Sûriya nû de digehên mafên xwe yan na?


**Can kurd:** Kesek nizane wê dema li pêş me çî berheman bide, hema em ji dûroka mirovî û ji ya gel û neteweyan fêr bûne, ku gava neteweyek azadiya xwe bixwaze û jê re amadeyê qurbandayîne be, wê bigihe azadiya xwe. Wekî niha dixuye, civaka nêvneteweyî, di bin hikariya hinek aliyan de, ne amade ye, ku Sûriya ji va rewşa wêran derkeve, heta ji wan re zelal nebe, ka deselata Sûrî paş roxandina sîstema Esed dikeve destên kê. Kurd wê destvala derkevin eger nebin hevparê va şorişa lehengî. Divê gelê me serpêka gelên Iranê ji ber çavan wînda neke, û herdem amade be bo hilgirtina histobariya xwe ya welatî.

**Pênûsa Nû:** Bi dîtina te, peymana Hewlêrê li ser xakê pêktê yan na?, astengî çî ne?

**Can kurd:** Ez ditirsim, ku ev „peyman“ bi mebesta lîwankişandina tevgera kurdî ye, ne bo xortkirina asta serhildanê ye di nêv gelê Kurd de. Peymana bi cîh neyê, wekî mala ku avakirina wê teva nebûye, mirov nikane tê de danîşe. Bi darê zorê jî peyman naçin serî û gava „niyyet!“ ne dirist bin, ew çî berheman nadin. Ji min re dixuye, ku hinek hêz hene, tew ji wan re ne giring e, ev peyman bi ser keve. Lew re jî xwe vir de û wê de badidin, da wê bi cîh neyînin. Ewana dibêjin: **„Zora min heye, ya we nîne!“** û cîyê ku zor heye, peyman jar dibin. Ewê jî astengiya tev mestir e li ber peymanêran.

**Pênûsa Nû:** Tê gotin û ragihandin ku egera damezirandina Desteya Bilind a Kurd hevdû razîkirina partiyên Desteyê, tu çilo dibînî?

**Can kurd:** Ez dibînim, ku amanca serekî a partiyên ewe, ku gel bibêje: **„Vaye partiyên me tiştêkî dikan.“** Lê di rastiyê de amanca gel ne yekbûn an parçebûna partiyên e, amanc bi dest xistina mafan e. Rêya wê jî, îro tevlêbûna serhildana gelê Sûrî ye, hema ta niha çî partiyê kurdî bi aşkerekî ew histobarî hilnedaye ser milên xwe. Hinek jî hene ketine bercewendiya sîstema Esed, û çî di nêv gel de dibêjin an nabêjin, nikane wê rastiyê ji ber çavên gel wînda bike. Ewana li hêminiya îro xudan derdikevin, lê naramînin, sibe wê çî bi seriyê wan û bi seriyê gelê me bê, gava ewana xwe ji serhildanê diparizin an neyartiya wê dikan.



**Pênûsa Nû:** Gelo çima gelek ji serok û rêberên partiyên me yên rojava di wexta şoreşê de çûne li başûrê Kurdistanê bi cih bûne?

**Can kurd:** Qey bersiva vê pirsê wilo zehmet e? Ewana dixwazin bidin xuyakirin, ku karekî mezin li wir dikan, û tew ji wan naye xwestin, di nêv gel de bimînin. Dibe jî, hinek ji tirsên kuştinê reviyane başûrê Kurdistanê, lê hinek jî li wir dimînin, da herdem partiya xwe bilindtir û hêztir bikin.

**Pênûsa Nû:** Tu helwêst û gotara nivîskar û rewşenbîrên kurd di wexta şoreşê de çawa dinirxînî?, gelo di asta şoreşê de ne yan ew jî hîna li kesayetiya xwe digerin?

**Can kurd:** Peyva „Roşenbîr“ ji roşengiyê hatiye, û lew re gavên pêşîn di têkoşîna azadiyê de ewana bi gotin û nivîsînên xwe davêjin. Mixabin hinek hene ji roşenbîran, ta niha jî nikanin cîhên xwe di nêv va têkoşîna dûrokî de bistînin, ji wan jî hene niha li ser her tiştêkî dinivîsin, hema li ser va qirkirina xûnî an li ser axazên „daxwazên“ gel peyvekê jî nanivîsin...

Dibe ku yekî ji van „pênûsên razayî“ li ser mifayên xwarina „Encûrên keran“ tiştêk nivîsandibe. Rast ez berhemên hinekan ji ber wê „Bêxemê“ tew naxwênim. Peyva „Roşenbîr“ gelek navên mezin li cîhana şorişê tîne bîra mirov, hema pir hindik ji wan Kurd in. Komikeka piçûk jî heye bi dil û can, bi roj û bi şev bi şorişvanan re dimîne, heta xewnên wê komikê jî li ser şorişê ne, dilê min bi wê re ye, ewan mirov in „taybet in“ di nêv gelê me de.



**Pênûsa Nû:** Tu vekirina hol û navendên çandî û siyasî, çi ji hêla partiyên ve û çi jî ji hêla dezgeh û rêxistinên ve, çawa dibînî?

**Can kurd:** Pirs ewe, gelo bo çi van melbend û baregeh heta niha tune bûn? Qey Esed nedihêşt û van „Selefi“ dihêlin? An valahiyeke siyasî û sergeranî „îdarî“ li Rojavayê Kurdistanê pêda bûye? Eger wilo ye, kanî wan pêşmerge, yên ku van melbendan biparizin? Qey ew histobarî avêtine ser milên PYD? Ma mirovekî „rexnevan“ dikane di saya PYD de tiştekî ku ew pê bawer e bibêje? Bersivên van pirsên giring divê tevger bide. Hîngê em ê bizanin, ka niha çi pêwîstir e, ku bite kirin, melbendên roşenbîrî an avakirina hêzeka neteweyî ya paristina rastîn a gelê Kurd!

**Pênûsa Nû:** Li dema dawî, gelek dezgeh ku mîna sendîqeyan e, li hin bajarên kurdan hatin damezirandin, serberdana damezirandina wan dezgehên çawa dibînî?

**Can kurd:** Di rewşeke wilo wêran de, her kesek dixwaze ya di dilê xwe de bîne der. Hêz û part û komikên cihêcîhê hezdirin, xwe mîna deselatdaran bidin xuyakirin, lê ev giş bê pilankirin dibe, ew jî wê dergahin tariyê li ser gelê me vekin. Ka hêzbûna desteya Kurdî ya Bilind heye, da van sendîkat û mendîkatan li rêz xîne û bixîne berdestiya gelê Kurd?

**Pênûsa Nû:** Bi gumana te, nivîskar û rojnamevanên kurd dê karibin kesayetiya xwe, hêvî û armancên xwe di wan dezgehên de bibînin?

**Can kurd:** Kesê rêzgirtina xwe dike, dikane her di dereke teng de jî kesayetiya xwe biparize, lê belê kesê „dûvik“ li asîmanê fireh û kûr jî dimîne dûvik. Dibe ku roşenbîrek bi mezinekî neteweyî an bi hêzeke siyasî hikar bûye, ew jî gelek sirûştî ye,

hema nabe ew bibe koleyê wê kesayetiya an wê hêzê. Cegerxwîn endamê partiya Hemîd Hac Derwêş bû, ku bi salin dirêj digot „Gelê Kurd li Sûriyê hindikiyeke neteweyî ye“, hema Cegerxwîn serxwebûna gelê Kurd dixwest û herdem digot „**Kurd neteweyêke xudan mafê serxwebûnê ye**“. Mixabin, hinek tarîbîr hene li ser Azadî û Serxwebûnê her roj guhên gelê gêj kiribûn, lê gava serokê wan, an partiya wan, jê re got „Em ji niha pê ve Serxwebûnê naxwazin!“ ewana jî bûn papagayên „îdareya zatî ya demokratîk ne ya neteweyî“. Cegerxwîn kesayetiya xwe parist, hema ewana nikanin tiştekî biparizin.

**Pênûsa Nû:** Tu pêşeroja kurdan di Sûriya nû a piştî rûxandina rêjîmê de çawa dibînî? Gelo wê kurd karibin bighên mafên xwe, yanşoreşa kurdan piştî rûxandina rêjîmê destpêdike?

**Can kurd:** Hezar û pênsed salin siyasetmendên Erebbî hîn jî baş tenegehîştine ola xwe ya îslamî, ku bi zimanê wan hatiye belavkirin, wê demeke pir dirêj jî wilo bimînî heta têbigihin „Demokratîyê“, ku ji derveyê cîhana wan hatiye. Ev jî egereke an astengiyêke mezin e li pêş me. Me dît, ku siyasetmend û sehêzên leşkerî û mafnasên pir bi nav û deng di nêv hembervaniya Sûrî de, ta niha nikanin mafê gelê Kurd biparizin. Mixabin heta nûnerên wan hindikiyên fileh jî, ku pêwîst bû li aliyê gelê me rawestiyana, ne li aliyê nijadperestên Erebbî, ketine rêzik ê senger dij bi mafê gelê Kurd. Ta niha jî ne xuya ye, ka wê „Destûra Nûjen“ di „Sûriya Nûjen“ de çawa be. Pişt re em ta niha nizanin, gelo heta çi pileyê para hêzên „Demokrat“ di deslatdariya nûjen de wê hebe û bi hikar be. Lew re ji rêber û serkêş û xebatkarên Kurd tê xwestin, û di serî de ji roşenbîran, di nêv şorişê de cîhên xwe bistînin, bi derdora xwe

bidin pejirandin, ku mafê gelê. Kurd heye û Sûriyêke nûjen bê dayîna mafê gelê Kurd ne azad û ne demokrat e ... Ne jî îslamî ye

**Pênûsa Nû:** Tê ragihandin ku rojane li dora 500 kesên kurd koçberî başûrê Kurdistanê dibin, gelo ji ber çi, çima koçber dibin û li ser xaka xwe namînin?

**Can kurd:** Ewe heta çi pileyê rast e, ez nizanim, hema ez dizanim ku di dûroka Kurdistanê de herdem koçkirinên wilo mezin pêda bûne, hinek ji wan jî bi derve de, wekî Xurasanê, Qoniya, Welatên Erebbî û Qafqasiya... Lê bêtirê wan koçkirin di nêv Kurdistanê de mane û çêbûne. Em navêd gelek êlên Behdînan li navçeya Kurdayê dibînin, û nivîskarekî Lorî, ku me berî niha bi mehekê gotara wî wergerandibû, dibêje ku piraniya padişahên Loristanê ji koçkiryên Kurdên Kurdayê an „Cebel Alsimmaq“ bûn, ku li nêzîka Idliba Sûrî ye. Bêguman ewana jî ber du egeran koç dikin, yek ji ber zordariya deselatê û ji metrsiya cengê ye, yek ji ber rewşa aborî ya wêran e. Ewana hîvî dikin, ku piştvaniya birayên xwe li başûrê Kurdistanê bi dest xînin. Rast teviya Kurdistanê ax û xaka wan e, hema ez hîvdarim, ku ewana paş roxandina sîstema dîktator li Sûriyê û azadbûna rastîn li Rojavayê Kurdistanê, dîsa vegezin mal û warên xwe.

**Pênûsa Nû:** Tu rojnameya Pênûsa Nû çawa dibînî? Bi dîtina te em çi din bikin wê baş be da ku rojname ber bi pêş ve biçe?

**Can kurd:** Pênûsa Nû bizaveke camêr û giring e bo nasdana ramanên roşenbîrî û bo piştvaniya têkoşîna gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê. Tiştê tev giring ewe, ku ew serbixwe bimîne, nekeve bin basikên çi hêzan an rêgahên siyasî yên ku wekî rêgahên sofîyan ketine nêv rihên hev. Azadiya peyvê, li gel rêzgirtin ji kelepora olî û civakî ya gelên herêmê re, pir giringin, da di nêv gelê me de tûjbûna ramanî pêda nebe. Divê bi rêya hinek xebatan, xwe maldartir bike, da hinek kadroyên valakirî ji xwe re pêda bike, û pir pêwîste mirov ji xebata ên dora xwe û ên berî xwe fêr bibe, ewan jî gelek in. Bi giştî:

*Ev bizaveke pîroz e û destên We tevan bimînî sax.*

*Serkeftî be ..... Silavek ji dil*



## Newaf Mîro

newafmiro@gmx.de



## CÎHAN KAL BÛYE

Kalê Xişo, bi pişta ku qulûsî bibû û bi liva kalbûnê re bi gopalê xwe, bi koteka di hulhulî. Taqeta wî kêmbûbû, lewma jî serê çend gava radiwestiya û di ber xwe dikire kurtepişt.

Lewma jî gundiya bi çavê xurifiya li wî dinerîn. Lê di rastiyê yên wî fêhm bikirana kêmbûn. Yên wî baş fêhm dikir hew mabû cî û warê wî. Wî gava taqet bi xwe re bidîta derdikete nava gund, û li derdorê xwe, çav digerland. Bi çav gerandinê re serboriya wî, li ber çavê wî zindî dibû. Li ber çavê wî keriyê pez, boşê deva, naxira dewara û keriyê xezala bi hev re diçêriyan. Xuşe xuşa ava çem û kaniya. Mêrg û zozanê rengîn û refê keçik û bûka. Kevaniyê dilovan, dewkilê ku ji nivê şevê de dew dikilandin. Xelkê jêhatî û merd. Salên xelayê û celayê. Salên qimil û kuliya. Salên birçibûn û hejariyê. Di wan salên ku mirov ji bo gepek nanê genimê can didan. Yan jî pariyek nan bi serê mêrekî bû. Di wan salên rebeniyê de çawa mezinê êlê û xatûna wî, devê sifreya xwe ji wan re vedikirin. Weke ku bi devê xwe her dubare dikir û digot; "Hestiyê me ji Xwedê li goştê me ji wan bû. Ne ew bûna em ne diman li jiyane".

Li ber çavê wî konê kurmançî, yê neh stûnî. Yê ku ji mala gran dibû star û hêlm. Keriyê pez û malbata mezin, hemû di bin wî konê de di hêwirîn. Di bin konê de dengê awazên dengbêja. Delalê Edûlê, mêrxasiya Dewrêş ê Evdî, dilsozî û zîrekiya Sahdûnê Evdî bi peyvên efsûnî dihate hûnan. Zikê wan birçî lê xeyalê wan tîr û tje evînî û dilovanî bû. Her gava dengbêja dawî li stranê dianîn. Dibû tewe tewa civatê û her digotin; "Dengî li dinê be. yan jî; tu nemirî..."

Kalê Xişo di wê kêliyê de bi xwe dihisya û wî jî, ji xwe bi xwe re digot; Derewee her tişt derewe. Hemû mirin û çûn ez mame li şûna wan.

Ez mame xwelî li serî û reben... Ez, ez, ezim yê li şûnwara mayî.. ka ezê hê çî bibînim û çiqas derda hilînim.. aaxxx êdî ax jî, min na hêwirîne..

Pişt re dîsa radibû ser xwe û çend gava diçû. Û di ber xwe de diloband.. Piştî çend gava, dîsa xwe dida ser kevirê û radiwestiya. Dîsa dihate ber çavê wî qeflê bêrîvana û dengê bilûra şivana. Dihate ber çavê wî govend û dawetên li ber bilûrê. Ew dawetê milmilane, yên ku mirov bi hev re dibûn weke refê qulinga. Bi hev re dihejriyan û diqeriyen. Tepîn û gurmîn ji erdê dianîn, bi sol û çaroxên xwe. Bi kincên spî û rengîn, jin weke ferîştayan dihatine dîtin. Keç û jin dibûn xemla govenda û jiyane. Wî bedewiya wan keç û bûkan, ne li ti devera û li tu evda didît. Ew di asoyên wî de dibûn melek û ber bi ezmana ve firiyabûn. Û ew govend û dîlan kesekî nema karîbû bilîze û bike. Ew çêj û nîmeteke ku mirovê vê serdemê, ne hêjayî wê bûn ji bo kalê Bêco. Li ber çavê wî govenda granî, çiqcanê û ya dulind, sêling, çarling û narê di serhev re di geriya û diqelibî. Û xortan di ber re dîlo û stran digotin weke; "Bihare mî dizên e, bexê wan kal e mî ne, gewr dibên em gewrin esmer tehmê dinyê ne, kula li vî dilî dîlo..". yan jî: bila nehata zivistan hişin nebûya mûristan, silave li zerya gişkan, ilem jî li kember sistan kula li vî dilî dîlo. Dîsa kulê Kalê Xişo dihatine bîriya wî û ji xwe re digot; Kul û xem mane para min. Yê li şûnwara mayî, qulingê ji refê xwe qety ayî ezim ez..

Dîsa çend gava diçû û bê hal diket. Pêre jî çavê xwe digerlandin. Gava bala xwe dabû erdê û derdor, dît ku ew rengê berê, yê axê hatiye guhertin. Dît ku ew dar û devî nemane. Dît ku refê qitik û kewa nema dixwînin. Û hawîrdor bûye şûv û pirêze. Erdê vala û bêxwedî nema ye. Wî salên xelayê dîtibûn û derdê xizaniyê jî. Lê wî, ew çend

erd reben û bê reng ne dîtibû. Bi destwerdana ax û erdê re, cîh nemabû ji teyr û tilûkên çolan re. Kalê ji xwe re got; Êdî ev Cîhan pîr bûye. ..Cîhan pîr bûye yan jî ez?.. Çavê wî bi zarokê ketibû ku gogê lekinî li ber lingê wî bû û diçû. Banî zarok kir û got; "Lawo ka ji kalîkê xwe re tasek av bîne!" Zarok li aliyê wî nihêrt û got; "hevalê min çûne gêra gogê, ez ê ji wan bimînim..." û çûbû.. Kalê di ber xwe de got; zarokê vê demê jî şîr heramin.. û dîsa hêdî hêdî ber bi malê ve dilikumî.

Gava nêzikî malê bû, çavê wî li mala kurê wî ketibû. Ew kurê ku ji bo wî bûbû neyar û dij. Ew kurê, ku bi keçeke misilman re zewicî bû. Bêyî biryara wî. Ew kurê ku dixwest bi kotek wî bike misilman. Ew kurê ji ber bavê xwe şerm dikir. Ji ber kinc û pêşîra wî. Wî navê wî kiribû "Mala şîr heram". Û di ber xwe de dîsa digot; ew ê bimire û ez misilman nabim!. Bila misilmanetî ji wî û jina wî ya petoxî re be. Ez ji bav û kala ve êzdî me û ezê êzdî jî bi mirim. Bila li mirinê jî ew neyê ser min, û destê wî yên heram û çivir bi canê min yê pak nebin. Vêca wî gotiye; Ger li mirinê be jî ezê wî misilman bikim!. Ma heta ruh li ber vî canî de hebe, ez misilman nabim. Gava ez mirim... ma mirî dikarin ola xwe biguherînin?. Ez ê gunehê xwe bikim histûyê gundiya. Bila tu kes min neşo, ji malmezî û malxasên me pêştir..

Heta digiştê malê roj ber bi ava ve diqelibî. Bi destpêka êvarê re ew dîsa li hejarxana xwe dihewirî û çavê wî li derî bû. Ku hin xêra miriya, yan jî êvar îniya derxînin û bînin ji wî re. Zarokên Kalê Xişo bi demê re ola xwe guherandibûn û bûbûn misilman. Û ew mabû êzdî. Lewma jî nema hay ji wî hebûn û xweyîti li wî dikirin.. Kalê bi xêr û xêratên gundiya di jiya û sax bû. Çavê kalê li roja li ber ava û li derî mabû. Pêre jî qurequra zikê wî bû..

## pirtûkên nû

## Pêlên Eşqê ya Dirbas Mistefa bi tîpên latînî çap bibû,

Pirtûka Dirbas Mistefa "Pêlên Eşqê" ku demek berê li başûrê Kurdistanê bi tîpên Erebî hatibû weşandin niha li Bakur bi tîpên Latînî hat weşandin. Pirtûka ku ji Weşanên Dîwan derketiye tede helbest û peşan hene.

Dirbas Mistefa yek ji helbestvan û nivîskarên nişê nû ye başûrê Kurdistanê ye ew xwe wekî peyrewên Melayê Cizîrî ye ku "mubtelayê eşqê" bûye dihesibîne.

Mistefa di pirtûka xwe de helbest û peşanan bi hev re dihene û di vî warî de nimûneyeke din li edebiya kurdî dike. Ew dibêje ku helbest û peşan bi hev re, bi zor dikarin derdê "pêlên eşqê" binin ziman.

Mistefa, nivîskar, helbestvan û rojnamegerekî çalak e. Ew xwendevanan vedixwîne nav pirtûkê û wisa dibêje: "Hûn jî kerem bikin, bikevin nav pêlên eşqê. Lê li xwe hişyar bin, li xwe miqate bin ku çu pêl li we nekevin. Nexwe dê deryaya evînê wekî ku gelek xeniqandine dê we jî bixeniqîne."



Dîwan Kitêb

Zeyrek Mah. Îtfaiye Cad.

No: 17/3 Fatih İstanbul

Tel: 0212 5344830

diwankitab@gmail.com

## PIRTÛKÊN NÛ

### Dîwana ( Guldeste ) ya Dr. Bedirxan Sindî derket

Li van demên dawî de, çapa diwem ya Dîwana (Guldeste) ya Dr. Bedirxan Sindî, li weşanxana VENG bi tîpên Latîni li Istenbolê çap û belav bû, tê zanîn ku çapa yekem li Dîmeşqê bi navê (Hozanî min) di sala 2009an de çap bibû, ev dîwan jî 340 rûpelan pêk tê û di nava xwe de 90 helbestan dihiwîne, ku di gelek deman de nivîsîne, ji wan vedigerin demên kevin û destpêka nivîsandina helbestê di salên 1960an jî aliyê Helbestvan ve, heya vê dawiyê ku helbestên wî yê nû wek ya (Ezbenî) ku gelek navdar bû.

Ev dîwan bi awayekî ciwan û bi rêk û pêk hatiye çap kirin û jî aliyê Nivîskar Zeyneb Yaş ve serrastkirina rastnivîsa wê hatiye kirin, û li ser bergê dîwanê yê dawî diyariyek hatiye nivîsandin tede weha hatiye

**"Ev berhem Pêşkêşe bo... Ruha wî kesî yê ku min li biçûkatîyê bi dizîkî ve berê xu dida wêna wî ya weşartî li binê canteyeka babê min û demê min gotbayê eve kî ye? Babê min, digote min, ne karê te ye, dê mezin bî, dê zanî kî ye.**

**Erê... Min zanî kî ye. Welê min hêşt nezanîye de kengî (hemî) hêviyên xudanê wênê bi cih ên, de kengê ew wêne li dîwarê, (hemî) Kurdistanê bêne hilawestîn. Xudêwo, tu bêjî ez dê berî mirina xu wê miradê bibînim? Bo te ye xwedanê wêna weşartî ya di dilê me da, her û her... Barzaniyê nemir...**

Dr. Bedirxan Sindî bejnik berz e, ji bejnên helbesta kilasîk û azad li devera behdînan, û cihekî wî yê xuya heye di meydana helbestê de li tevayî Kurdistanê, helbestên wî ramanên xwe jî eş û azarên kurda di nava wan demên bihurî de di jiyana wî de pêktên, û di nava wan rûdanan de, bi xemgînî û dûrbûn jî xizim û kesûkarên xwe geh li xerîbiyê geh di zindanê de, geh li derbiderî û koçberiyê, û ev demên zehmet di jiyana xwe de bi hevîrê helbestê



sitra ye û ji wan eş û kederan, dahênaniya wî dibîşkive û mêweyê helbestê digre, û xweşikîrîn peyv û ciwantiyên rist û bi hizr û birek bi hêz, bi awayê sirûdan ku mirovan pal dida nava şoreşê û wan dihiştin ku ruyê zulim û sitemkariyê de birawestin , weha dibêje di pêşgotina Dîwana xwe de " Hozan, derd e, eş e... Mirovî digirt welê derdekê xweş e... Êşeka tam şîrîn e. Mirovê hozanvan jî ez el ra bi meya kovaniyê serxweş e û berew ebediyetê diçit û gurzên pirsîyara didite ber sîngê xu... Çewa... Kengî... Bo çî...? weha pêda çûye heya ezmûna wî ya helbestnivîsê pêşketiye, û gelek helbestên nûjen nivîsîne, ku bi ruhê xwe ya netewayetî ve, ku wijdanê gel dihejîne, û bi xweşikbûna sirûšta Kurdistanê ve ruhê mirovan geş dike, û şîn û xemgiya xwe dixist nava helbestên xwe de, heta helbestên bi wan hestên xwe yê mirovayetî sînoren welat dibezanidin û li her çar hêlên Kurdistanê belav dibûn, çî bi rêka sitrana be ku mezintirîn hunermendên kurda wê demê helbestên wî kirine sitran û bi awazên xweş û nazik ew helbest dihatin tomarkirin û belavkirin, wek ( Tehsîn Taha, Gulbihar, M. Şêxo ... Hwd.

#### Kurtiyek ji jiyana Bedirxan Sindî

Dr. Bedirxan Sindî, nivîskar, helbestvan û wêjevanek kurd e û navekî naskiriyê di nav edebiyata Kurdî de. Li bajêrê

Zaxoyê di sala 1043an jî dayikbûye, .Di sala 1966an de, li paytexta Îraqê, li Bexdadê zanîngeh bi dawî aniye û di sala 1979an de li Ingilîstanê doktora Zanista Psikolojiyê wergirtiye. Di sala 1960an de dest bi nivîsîna helbestê kiriye. Helbestên wî bi zimanê Kurdî û Erebi, di kovar û rojnameyan de hatine belavkirin. Wî di destpêkê de gelek bi serkeftî helbestên klasîk nivîsandine, paşê jî yê serbest nivîsîne. Her weha gelek helbestên wî jî aliyê hunermendên Kurd ên wekî; Tehsîn Taha, Mihemed Şêxo, Erdewan Zaxoyî, Eyaz Yûsif û hwd...ve bûne stran û sirûdên Kurdî yê bi nav û bang.

Bi zimanê Kurdî û Erebi berhemên wî ; "Civata Kurdî Di Edebê Wî De", Sadiq Behaeddîn Amêdî, Nivîskarekî Kurd e. Memê Alan(Ji Kurdî wergerandiye Erebi), Zêmarên Çiyayî (Helbest), Helbestvanê Gundê Perîxanê, Pendên Kurdî(Pirtûka Berhevkarî ya Ordîxanê Celîl - Celîlê Celîl) jî tîpên latîni Vegustiye tîpên Erebi, Civaka Kurda Di Çavên Rojhilatnasan de, Hozanê Min(Helbest) û gelek pirtûkên di yê di warê perwerde û psikolojiyê de hatine çap û belav kirin. Her weha bi sedan lêkolîn û gotarên di warê; siyaset, çand, wêje, dirrok û folklorê kurdî de nivîsîne, ev gotar di kovar û rojnameyan de hatine belav kirin.

Li ser ked û berhemdariya wî ya çand û hunera Kurdî gelek bawername û xelat wergirtine. Her weha endamê gelek sazî û sendiqên rojnamevanî û wergêriyê ye li Kurdistan, Iraq û derve. Di jiyana xwe ya têt û tijî berhemdarî de bûye xwedanê gelek erk û wezîfeya sernivîseriya gelek kovar û rojnameyên wekî; Çiya, Hawkarî, Beyan, Rengîn, Rewşenbîrê Niwê, Kovara Şems Kurdistan(Bi zimanê Erebi) û niha jî li Bexdayê sernivîseriya rojnama "El-Te'axî (Birati)" dike..... **Hozan Emîn**

## PIRTÛKÊN NÛ

### DILYA û ZALAR a Mîr Qasimlo derket

Bi zimanekî romantîk, lirîk û bilind hatiye hûnandin, lê wekî avê avîxaran herikbar û giyana mirovan dîl digire. Em di wê baweriyê de ne, wê xwendevan li pey xwendinê bibînin ku ev roman bi qalîn û zimanê xwe yê wêjeyî yê dewlemend ve di romannivîsîna kurdî de qonaxeke nû veke.

Naveroka wê li ser evîne ye.. Roman jî vegotina jiyana du lehenê bingehîn, DILYA û ZALAR pêkhatiye. Li dor wan û evîna wan; jî aloziyên di nava malbatê de bigire heta rengê dengbêjan, têtîliyên taybet yê jin û mêt, namûs, kuştina jinan, sinnetkirina keçan, trajedyaya transsexualan, maxduriyeta elewiyan, evîna di navbera du baweriyên cuda de bi dehan pirsîgîrên civakî bi konseptêke dorfireh hatiye vekirin. Jiyana wan jî gundan xwe digihîjîne Ewropayê, jî ananeyên rizî ta modernîteyê berfireh dibe. Mîr Qasimlo; romana xwe wek romana bindestan û filozofiya bindestan bi nav dike û dibêje; Di romana kurdî ya modern de, çar babet kêm mane:

Cihnedana sosyolajîya Elewiyan,

Di hişmendiyê romana de bi serserkî danektina binê erdê,


Cihnedana sahneyên têtîliyên taybet ên xwerû,

û neafirandina karakterên jin yê xweser, xwedî kesayet..

Ew dibêje ku di van bebetan de me hin tişt bi serî kir.

Ji ber pirjimarî û desnîşankirina mijarên sosyolajîyê di nava kurdan de hene, em dikarin bêjin ev roman, romana gelekî ye.

Em wek weşanxana Ar, bi çapkirina romana DILYA & ZALAR, kêfxweş in



Ji romanê beceke kin: Tu hatî zozanên min ên kesk, bi ziman, lê ji şiyana axaftinê bêpar Tu hatî û tu bû tasek û te ji kaniya dilê xwe av bi min da vexwarin. Tîbûna min a hezar salan şikand..

Tu hatî û tu bû strana teyba dilê min...

Te awazand bi ser henaseyên min ên didildemayiyên nexweş...

Te nexweşiyê min kûrtir kir.

Te ew da noqkirinê.

Te ew nikul kir, te li pêncereşê veguhest.... Tu hatî û te zeviyên min ên li çolên dojehtî, bi xwedana xwe avda û te di qeşaya Berfbarînê

herî hov de, ez sotim bi gotinên xwe yê germîn...

Tu hatî zeviya min, te tovên bêrîkirinê reşand...

Her bihistek zeviya min deh bêrîkirin veda. Deh bêrîkirin rê li pêkhatina deh hesretan vekir.

Deh hesret bûn deh evîn

Deh evîn bûn deh destan

Deh destan bû tu û tu bû fêrbûn...Tu bû fêrbûn û te xwe li berîbedena min pêça. Te ez fêrî xwe kirim. Ez fêrî te bûm. Bûm tu. Bûm ferhenga jîna te. Lê tu nîn î. Ne di nava hebûnên asîmanî de, ne di şênayên min ên qîzanî de û ne jî li warê zarokatîya min a dildemayî de, tûmek ber bi çavî.

Bêje Lavingor, ka tu li kû yî? Ez va ye li vir im. Di ferhenga jîna te de, gotina nehatiye maçî kirin im. Va ye li mexelê hesretê, li perava bêrîkirinê me canyarê min..."

DILYA û ZALAR/ Rûpel 999-Weşanên Ar, Stenbol.

## Pênûsa Min îro

**Serhan Isa**

serhanisa@hotmail.com

**Di wê şevê de a ku pêjin  
û binefş dibariyan**



## BONIYE-SUAD CEGERXWÎN

**WERE  
BIHEVRE  
VEGERIN**



**Ebdilsemed Mehmûd**

**BAVÊ HELBEST**

helbestvan-98@hotmail.com



### 1-Di qurta dawî de

Dema şevê ber bi qurta dawî ve diçe,  
û pêjna te li dora payîzgeha dil nakim  
çavên xwe, yên ji xewketî didim hev,  
û di banahiyên hiş û sawîran de  
li te digerin,  
wê çaxê tenê ewrekî nebariyayî  
li raserî xwe re dibînim.

### 2-Di pêjna binefşan de

Dema te şelîpana kenê xwe,  
yê mîna, hênkahiya şeveqên Êzîdxanê,  
radikir şevîniyan,  
û ber bi cobarên xwîna min,  
a himhimî de serbijêr dikir,  
û xalxalok û pirpirîk,  
li min û xwe dicivandin,  
min zanîbû,  
êdî ku,  
tu bûye şahejina vî dil î,  
ey Binefşa ji Binefşan mayî.

### 3-Stêra li rojhilatê dil

Dema wêna mîna keleşstêrekê,  
di bê tîn şeva Rojperestekî de,  
wisa bê xwestekname xwe werkir,  
û di wê laşevê de,  
çira û çirawîskên perestgeha evînê gur kirin;  
Êdî wîna jî hêdî hêdî bi hostayî,  
seqema salan,  
li bejna xwe û wê,  
yên dev ji hev, sincirand.  
Û korepencereyên,  
ber bi asîman ve,  
li tanê piştê,  
li bendî rêwiya dawiyêşevan vekirî,  
li xwe dane hev.

Were bihevre vegezin  
Ev warê ha ne yê me ye  
Şoreşa me va gur dibî  
Omîda me her pê re ye  
Bayê aza bilind dibî  
Êdî ,asîmanê me ye  
Ewrê giran bela dibî  
Ronahî ji mafê me ye  
Were hevalo vegezin  
Welatê me , bende me ye  
Penaberî êdî bese  
Azadî daxwaza me ye  
Bi sala ye azariye  
Sitemkarî para me ye  
Meger em tev bihevrebîn  
Serfirazî , her ya me ye  
Gelê me va ye şer dikî  
Cenga wî her bê hempa, ye  
Were bese em vegezin  
Kurdistan her warê me ye  
Xaka welat va şîm dibî  
Qelen ,xwîna gelê me ye  
Qada xebatê geş dibî  
Tekoşîna bi hev re ye  
Were êdî em vegezin  
Guhertin armanca me ye  
Li gel hev em xebat bikin  
Yekîti dermanê me ye  
Şoreşa me pêşve diçî  
Serkeftin encama me ye  
Were ger em bihevrebîn  
Teqez pêşeroj ya me ye

### Peymangeha Qasimo

Bi hev re herin bi hev re herin  
Kezyê peyvên bi birin  
Tu yar tu xewen  
Tu berjewendî  
Li baskê demê siwarin  
Difirin  
Navenda tirsê  
Xwe ji jor ve  
Sêpîdar dike  
Peymana Qasimo  
Berfireh şirove dike  
Pêlên kurd li kolana  
Xwîna xwe tevî  
Buhrê dike  
Bi ser dikeve  
Balkêşe  
Bi bandore  
Bê sînore  
Li baskê emê  
Siwarin  
Difirin  
\*\*\*\*\*  
Pêşeroj  
Li ser xêza dawî  
Govend û şahiyên  
Ji pêşbirkan re  
Digerînin  
Alên dila  
Li ser tîpên evînê  
Li ber bayê sibe  
Dihejin in  
Li baskê demê  
Siwar in  
Difirin  
Bûka xwe ji  
Rojava derdix in  
Li ser destê Qasimo  
Mehra wê dibirin

## LAZGÎN DÊRÛNÎ

## Pênûsa nû



## AZAD RAMADAN

aand2011@gmail.com



## Li Ser Tilîka

Pênûsa nû lê dikim silav û rêz  
Serkarên wê yek bi yek dikim himbêz  
Pîroz dikim li we îro wî karî  
Vê helbestê ji dil dikim diyarî  
Pênûsa nû kovarek ciyawaze  
Serbixwe ye azad û serfiraze  
Rûpelên wê corbicor û rengîne  
Tor û helbest û raman û zanîne  
Armanca wê xebata kurdewarî  
Lewra divê ji bo wê alîkarî  
Nivîskarno ji we ez dikim hêvî  
Ji bo pênûsa nû nekin nemedî  
Berhem û gotarên xwe jêre rêkin  
Dîse gazinda û rexnê xwe lêkin  
Da em qizinc bikin îro derfetê  
Rakin ji serxwe vê şerm û minetê

Li ser tilîka û bi dizîka çûm civanê keçka biçûka  
Ramûsanê wê çî xweşin gava di dêm bi dizîka  
Li ber sirê û li ber sermê mi germ dikê bi vîna xwe  
Ta berê sibê min dihêlê ji nûka destûra min didî  
Bi is im isa û bi mesaca bi telefûnê ji mir rêdikî  
Ji min di xwazê zûtir herim li hêvya te me ser agirî  
Ez ketim bela keça biçûk bi evîna xwe mid şewtînî  
Ji mi têr nabê bi yek carî mid gerînê li vî bajarî  
Tiştê gelek ji mi di xwazê li min dikê hezar barî  
Çimkî destê mi jê nabî hingî nazike bêbavê  
Hevaltiya wê gelek xweşe ji dîtina çavê wê têrnabî  
Bi sed qîza na guherim şêrîntire ji hingivî  
Ji min dûtir bî sebir nayê bûye parçek ji vî dilî

## pirtûkên nû

## Çapa duyemîn a Mîrnameyê derket

Romana Jan Dost *Mîrname* bi çapa duduyan derdikeve pêşberî xwendevanan. Avesta çapa yekê ya *Mîrnameyê* di 2008an de çap kiribû.

Mijara "Mîrname"yê Ehmedê Xanî û dema wî ye. Lê ev roman ne biyografiya Xanî ye bi qasî ku ew biyografiya her rewşenbîrekî ye ku li hember desthilatdariya hundir û derve xebatê dike. Tevna wê bi tayên fantazy û tarîxê hatiye ristîn. Romanek balê dikîşîne ser nakokiyên siyasetmedar û rewşenbîran. Şeweyên tîkiliya di navbera wan de û berî her tiştî dixwaze ferqa wêjeyê bîne ziman, cihê nivîskarekî di civakeke mîna civaka kurdî de bide xuyakirin.

## Li ser Mîrnameyê çî gotin?

Zimanê Jan Dost ê rewan û helbestiyane, zimanê serdemên berî zuhabûn û talan û kavilan e. Xeyala kurmanciya berî şuştina mêjî û hestan e. Peyama Mîrnameyê ya bingehîn jî ew e ku romanên çêjamêz û çêjxweş dikarin bi kurmançî werin nivîsandin, lê ku neyên nivîsandin jî, sedema wê ne ziman e, lê bêhêziya nivîskarê kurmançiyê ye.

Ehmedê Huseynî, [www.rojava.net](http://www.rojava.net)

Nivîskar lehengê xwe ji meslekên cuda yên demê hilbijartiyê. Lê aliyekê dinê jî bi hilbijartina lehengan rewşa siyasî, civakî û sosyal ya demê û trajediyê kurdan jî berbiçav dike. Di nava şer û tixûbên nediyar yên osmanî û farisan de ji ermen, êzidî û gurciyan jî lehengan derdixê û bêbextiyê li dîrokê nake

M. Şefîq Oncu, [www.netkurd.com](http://www.netkurd.com)

Nivîskarê Mîrnamê Jan Dost ji binê barekî gelek giran, bi rihetî derketiyê. Çiroka romana Mîrname ya taybet nîne. Ku hebe jî, kes nikare bi rihetî bêje, ma çiroka Mîrnamê ev e! Û jixwe Mîrname bi xwe jî, wî tiştî mukur tê.


Alî Fikrî Işîk, [www.netkurd.com](http://www.netkurd.com)

Mîrname romana rêza dîrokî ya dawî ye, ku nivîskêr di romanên xwe yên bi navê Mijabad û 3gav û 3darekê de bi pêş de aniye. Jan Dostê ku kesayetiyên girîng ên dîroka wêje û politîkaya kurdan a heyama dûtir û nêzîk bi "hal û mercên safî mirovane", bi kurdîyêke tu nemaye bê kêr û kasî vedihûne.

Şener Özmen, [www.diyarname.com](http://www.diyarname.com)

Mîrname, bi zimanê xwe, bi dewlemendiya çîrok û çîrvanokên xwe, bi mijar û vegotin û vebêjerên xwe, bi terz, uslûb û estetîka xwe romanek hêja û "yekane" ye. Ji bo wêjeya kurdî -wekî romana Mehmed Uzun, Bîra Qederê- qonaxek nû ye û deriyek ku vedibe dinyaya wêjeya cîhanî ji me re vedike

Bawer Ronahî, [www.diyarname.com](http://www.diyarname.com)



Mîrname

Jan Dost

Çapa Yekem: 2008

Çapa Duyem: 2012

ISBN: 9789944382472

19.5x13, 232 rûpel, 16 TL

[www.avestakitap.com](http://www.avestakitap.com)<http://www.facebook.com/wesanenavesta><https://twitter.com/avestayayin>

## Yehya Elewî Ferd\*



## Pênc helbestên bijartî

## Dengê çîyan

Hekayeta min û te  
Hekayeta kanyan e  
Li beyna me çîya ket  
Çîya tijî dûman e  
Kanî hatine kelîne  
Çûn û ji hev dûr ketin  
Ji rêçûya çîyan da  
Zîne zîne daketin  
Dengê avê bela bû  
Li nav nalan û çîyan  
Şibe çû û wînda bû  
Li nav xicavî mêyan  
Çîya sa me dixwînin  
Li benda kurdan mane  
Dengê çîyan û kanîyan  
Nalîna kurmancan e

## Dû Dar

Li ortî cadêkê darek hişîn bû  
Çav li jûr û ji asimîn kûtel çû  
Hişînya xwe rû li xedê bela kir  
Li temûzê sa rêçûyan sêya kir  
Darek haka pey da nebû li refşê  
Ne ber bi wî bivir hatin ne tefşê  
Li payî wî darek qîçik li jîr ma  
Li karêne qîçik qîçik hîsîr ma  
Li ortî rê xwe şev û roj pan dikir  
Bîçîkê xwe li çavî xelkan dikir  
Iro cînarek çû bivir bikirrê  
Bi destî cînari dare bû gore

## Gepê kullan

Gepê çîyan berf e  
Gepê cûyan av e  
Gepê evan hêv e  
Gepê rojan tav e  
Gepê gulan ref e  
Yî bilbilan deng e  
Gepê daran mêv e  
Gepê çûlan reng e  
Kullan gepê xwe got  
Gepa min û te ma  
Ji me nema sa çî  
Gepek li wî dinya

## Şelpe û sêv

Şelpe û sêv bi hevra

Li ser darek hişîn bûn  
Bi hevra av vexwarin  
Ber bi tavê kûtel çûn  
Şelpe û sêv bûne sor  
Ketin li ber darê xwe  
Iro mirin bi hevra  
Teva kirin karê xwe  
Ew sêva xelkê bir û  
Bi destî xwe berf kir  
Şelpe li bin darê ma  
Şemali bir telef kir  
Hişîn bûne sor bûne  
Cûne li vir neman e  
Hinik natî şelpan e  
Hinik mîna sêvan e

## Çîyan

Çîyan xwedênas in  
Mîna îmaman in  
Welatê kurdan in  
Şûna kilaman in  
Çîyan tijî reng in  
Çîyan tijî deng in  
Çîyan birayên me  
Çîyan sa me xweng in  
Mîna di bavek rind  
Xwarin dane ber me  
Ava çîyan sar e  
Nanî çîyan germ e  
Mîna dapîra me  
Mîna bapîra me  
Şûnî çîyan wextek  
Nerre ji bîra me

\*Yehya Elewî Ferd yek ji helbestvan, rojnameger û nivîskarên kurdên kurmançê li Îranê ye. Di sala 1973'yan de, li gundê Baxçig a ku li şerê Bocoñurd li parêzgeha Xorasana Bakur li Îranê ji dayîk bûye. Ev 20 sal in helbestên zarokan û nûciwanan bi çar zimanên: Kurdîya kurmançî û farisî û erebî û inglîsî dinivîse. Wî bêhtirî 10 xelatên helbestan li Îranê hilgirtîye. Ew niha li bajarê Qomê jîyan dike. Heta nika bêhtirî deh pirtûkên wî li Îranê, Îngilistanê, Iraqê û Tacîkistanê hatine çap kirin

## SILÊMAN AZER



## Wê bêjin

## 1

Digotin,  
Ji pêjna te yî kevnare ve,  
ez hebûna xwe li bejna te digirim.  
digotin,  
min ji nezaniya xwe,  
bi tenê sirûda te ezberkiriye.  
bi tenê ez lavijên te,  
di pîroziyên xwe de dixwînim.  
digotin.....,  
ez dergevanê derbasbûnê me.  
li ser keviyên nerînê,  
ez xêlvaniyê,  
dengê xwe me.  
Li wir....li vir...  
ez bi tenê nanê gotinê di pêjim.  
di perên gotina xwe de dilikumim,  
û,  
rûpelê guheztinên xwe di guherim.  
digotin,  
min digot,  
hespê min şeqe şeqê bi meydana,  
şevê dixê.  
ba mîna gustûlekê,  
di tiliya min de diraze.  
hemî derbasbûn,  
bi pîfa min re dihejin.  
xwezî,  
li ber sîtava dengê min  
xwe divemîtinin.  
ma ez,  
bêjeyên tirsonek bi darve bikim.  
di bêjin,  
cih li ber bîna hatina min di lerizin.  
Ji nişkave,  
ez li ber barîna te diweşim.  
mîna sawîrên dev li ken.  
min jibîrkiriye,  
demên jibîrbûnê,  
di vedana bîna te de.

## 2

Bere hebûna te,  
bibare li dîtînê.  
êşkereye,  
beza demê li ber hêlana te.

bere,  
bipêçin sawîrên xwe li derdora,  
vezilandina topraxên te.  
bere,  
berhilgirtina te,  
mîna berbangê xwe raxe,  
ser wê xweziyê.

## 3

wê bêjin,  
di tûrikê şevê de derbûn.  
ma te xwe perwerde nekiriye,  
zayîna cinan.  
wê bêjin,  
tu ji tovê kavilan pekî,  
ser riyên vejînê.  
tu çî halanan,  
dihilçenîne,  
li ber şopa xweyî,  
westiyayî ji dilbijiyê.

## 4

wê bêjin,  
keviyê xweziyên te,  
çendî nermin.  
tu li ber hilma şevpestên xwe,  
kûmira silbûna xwe gur dike.  
ji gana teka ve,  
tu demên xwezayînê,  
dinixumîne.  
wê bêjin,  
keriyê pezkofîyan,  
ne li ser kopê sîpanê xelatê,  
diçêriyan.  
Memo ne di ber evîna xwe de,  
jiyan ji dest da.  
belkî navê te jî ne,  
ne yara min e.





## Mizgîn Hesko

## Gava xewn bin av dibin

## Bexşan

## Ji bo ewan hêviyên ku di Deryayê de bin av bûn




Hîna mirin  
Ne gihîştibû Şar  
Lê li hawîrdorê wî dileyizî  
Min xewnên xwe  
Xistin tûrikekî spî  
Û ew li milê  
Pêçeka xwe kir  
Min çendekê xwe yê lerizî  
Xiste nav destên nervînê  
Û li Keştiya hêviyê siwarkir  
Min digot:  
Di Deryayê de  
Ez ê li rasta Nehengên zêrîn bêm  
Ez ê li rojavayê din  
Li rasta xewne xweşên şevên xwe bêm  
Û hîna bi rêde  
Ez li rasta xapînan hatim  
xapînen Deryayê  
xapînen Mirovan  
xapînen Jiyane  
û xapînen xewnan  
Erêêê...  
Bi hişekî şerpeze  
Laşekî westiyayî  
Û dilekî ji Deryayê  
Miştir kul  
Min ji şikestina rojan e  
Berê xwe dida  
Bextên hovan e

Berya ku bêm  
Pîrka min...ji min re got  
„ lo ...Neviyê min....bireve...mirinê devê xwe vekiriyê...  
tu here  
piştî nimêja berbangê û berya ku sitê rakevin., ez ê jî bi  
dilekî rehet...serî bispêrme axa zuha  
li ber min neke ve...bi hijmara mûyên serê xwe min derd  
dîtin e...lê derdê we na.....na“  
Erêêê.....  
Bi hişekî tar û mar  
Laşekî giran  
Û dilekî ji Deryayê  
Dagirtîr xem  
Ez ji ber şikestin û felekreşîya xwe direviyam  
Berya ku bêm  
Bavê min  
Ez têr...têêêêêêêê maçkirim:  
„ Kurê min....ji pêlan ne tirs e, bi kotekî te xwe ji leşkeriyê  
rizgarkir  
di kolanê de, gulleyan rêka xwe di laşê te de nedîtin,,  
û va te sînorê serxetê yê tijî bombe  
li pey xwe hêla.  
Ji xwe Kurê min tu mîna Masiyan bi avê dizanî, ava şor pir  
hêsan e.“  
Erêêê.....  
Bi hişekî kewitî  
laşekî vemirî  
Û dilekî ji Deryayê  
Tijîtir kovan  
Min berê xwe da rêka bê vege  
Berya ku bêm  
Dayka min

Ez berbi himbêza xwe ve birim, û ez  
têr...têêêêêêêê bînkirim:  
„ Şêrîne min, te got : li Başûr ez ê bibim  
Pêşmerge  
min got ...here bila dilê min bi tere  
te got: Li Bakur ez ê bibim Girîla  
min got....here bila kezeba min bi tere  
te got: Li Rojhilat ez ê bibim çira  
min got...here bila hişê min bi tere  
lê Şêrîne min: nûka berbi Deryayê ve neçe...  
şevê din „tu li ber çavên min di nav aveke  
zemzemî de ji nuh ji dayik dibûyî  
Berxê min neçe.“  
Û berî oxirê  
Hêsrên min  
Tevlî pêlan dibûn  
Û hêdî...hêdî Keştiya hêviyê bin av dibû  
Û pêre...pêre xewnên min:  
Ho ... çendîn min ji Deryayê hez dikir  
Û wê ji mirina min.  
Ho...çendîn min ji bîna Xakê hez dikir  
Û wê ji rûbarê xwîna min.  
Ho...çendîn min ji Asoyê hez dikir  
Û wê ji baskokirina min.  
Ho.....mirin dibar e.....Zemîn tijî Ezdehak  
bûye...ma kanî Kawayê min.  
Pezkovî, bi quloçên  
xwe, kezeba yaran diqelêşe  
Ma kanî Tir û Kevanê min.  
Derya mişt xwîn bûye....ma kanî Keştiya  
çareseriyê min.

## Lewend Dalînî

## Miradê Sêvê 1922-1976



## Endezyar û Pispore hilkirina maîn û Bimbê Sînoran

Piştî Peymana Saîks-Pîko, û perçebûna Kurdistan, û xetkirina sînorê serxet û binxet ê, ku hate naskirin bi navê xeta Ferensawî, di navbera Sûrî û Tirkî de!? Gel ê Kurd, ji hev hate cudakirin, bira ma li serxetê, xuşk ma li binya xetê.

Am û brazî, bira û bira, pismam û dotmam mane bi hisreta dîtina hev? û rûniştina di gel hev?. Vê yekê tîna dilê dijmin hînik ne dikir, lê gelekî bi wêdetir, kûrtir û dûrtir çû!?. Ev pîlana kû bi destê Ingilîz û Ferensawî ya hatibû sazkarin û li ser xaka her çar parçê Kurdistan ê hate bi kar anîn; tanî roja iro jî gelê Kurd mafê wê bi xwîne didê û di astengiyên saîkologî de dijî!? Û eşkenceyên wê di kûraya dilan de didomîne.

Biryarek pir giran û dijwar hate dan! Piryara çandîna bimban, li ser □ar rêzan û ji du beşan; misînkî û beroşkî, li seranserê sînorê nabeyna serxet û binxet ê de, hate dan û di salên pêncîyê de û ji alî yê rejîma Tirka ve hate dest pêkirin. Endezyarên wê rêjîmê û bi alîkarîya hêzên biyanî sînor bi tamamî dane çandin; ne bi genim û ceh? Ne bi gul û beybûnan; lê mixabin bi bimbe û maînan!?.

Her bimbeyekê di pêşerojê de, wê bibê qesasê serê kurdekî; mafê her yekê jiyana mirovekî ye? Û eger bi arzanî herê; wê lingekî an jî wê destekî bi teqîna xwe re bifirîne!?!?.dest, ling, ê jinekê, merekî, zarokê, xortekî yan jî keçeke ku di şeva dawet û guhestina xwe de, û di dema derbaskirina sînor bi bûkanî ya xwe de, û bi teqîna maînê re, wê bibê dîyarîyek ji dijmin re.

Her dijminek ji dijminê vî gelê belengaz, bi awayekî wî didê kuştin û talankirin; li perçakî bi sêpiyan wî bi darvedikê, li paçê din bi Napal û Xerdelê wîna wêran dikê, û di navbera herdu perçeyên din de jî, bimbê sînoran laşê wî perçe dikê, û li ser tîlên sînoran ê bi direh perçeyê laşan radixîne! ? û ji teyr û tebyan re, dibine şiv û paşiv.

Di rojhilata navîn de, kû pîrsa miletê kurd didane veşartin û bin axkirin, û gel roj bi roj bi destê dijmin dihate perçiqandin, û projayên windakirina nasnameya wî bi anfalkirin û rakirina wî ji xaka wî a kevînar ku bi hezarê salan li ser jîya ye; ew projeyên şofînîzmî li ser dihate pêkanîn!?. Lê ew kî bi hikmê hebûn û xebata vî gelê asteng, gelê mîrxas, canfîda û xebatkar û xwedî behwerî bi doza xwe; di bûne xewn û hin bi hin azadî û serxwebûn dibû stêrek geş û şan vedida.

Rê û deryanek di navbera gel ê herdu perçan bi bimbe, maîn, û nobetçiyên dihatin qutkirin, eger tê bi bimbeyekê neyê kuştin an brîndarkirin dema tu bixwazê sînor derbasbikê!? Bê goman gulên Gawîça nobetçiyekî yan, fişekên, Tenzêrekê wê canê te bê gule barankirin.

Û bi vî awayî bi hezaran û hezaran kesên ku hatibûn kuştin; laşên wan bi devê wawîk û guran

hatinbûn xwarin û eger destek, yan jî lingek bihata firandin bi teqîna maînê re wê tanî dîmahîkê, jiyana xwe bi seqetî yan jî bi destekî tenê wê berdewam bikira û weke hisretekê pîre roj bi roj dijîya!?!?.

Mixabin dewleteke weke Swêdê ku di warê mafê mirovan de, bi xurtî tê naskirin; not ji sedî ji maînê ku tene frotine van rêjîman; ji çêdikira wê yê!?!?.

Gelek mîrxas û rêzan bi vî yekê mijûl bûn û hêdî hêdî û bi şevê xwe berdan nav maînan; û roj bi roj hînî endezyarîya çandîna wan dibûn û weke pispore hatin naskirin.

Miradê Sêvê jî, Yek ji wan kasan bû, û nav û dengê zîrektîya wî li temamê herîmê hate belavkirin... ji Dêrka Hemko Tanî bi Aûdê. Rê û şop kû bi şev û rojan, dibin tîrsa şevan de ji bimban; hatin paqij kirin û bûne pîrê çûn û hatinê



di laşê sînor de.

Miradê Sêvê kû hatibû naskirin weke pisporekî di hilkirina maînan de, di sala 1922 an de li gundê Şaxê, ê mîr Bedîrxan ji daîk bû, û ji ber ku bavê wî hîna ji zaroketîya wî de koça xwe barkir bû; bi navê diya xwe dihate paşnavkirin û naskirin. Lê koka malbata wî: (li gorî ku herdu torînen wî Sûleyman û Brahîm û Xelîlê Sasûnî jî kû hersîyan eşkere kirin); vedigerê Saîdxan û Bedîrxanîyan.

Mirad kû bi mehkûmîya kuştina çend cendirmê wê rejîmê bin xet bûbû, li gundê Xalid Gulo bi cihbû, û peyre koça xwe bire gundê Qere Hesenê, ê nêzîkî sînor û li wir jî gorbihîşt bûbû.

**XEBATA MIRAD A NETEWÎ:**

Xebateke netewî û granbûha kû di jiyana Mirad de hebû û bi sedema tîrs û zordestîya wê demê, kû

mabû veşartî û peyre hate eşkerekirin ewbû ku Mirad mainên ku ji xeta sînor radikirin; di rîya endamekî ji PDK dişandin şoreşa Berzanî yê nemir. Û bi salan û bi bê dengî Mirad xebata xwe bi vî rengî berdewam dikir û weke depoyek çek û sîlehan, şoreş zengîn dikir.

**MÊRXASÎYA MIRAD:** Bi teqîna maînekê re; dengvedana qêrîn û hawara daîk, jin û zarokên seranserî wî cihî, belavdibû, û gundî bi tevaya xwe ber bi sînor ve diçûn!? Nêzîkayî li tîla yekemîn dikirin, û li wir dirawestîyan! Tenzêr û Cêmsan minawire li jor dikirin û nobetçiyên çavên xwe vedikirin û guhê xwe bel dikirin.

Aminiyên tifeng û Gawiçên xwe diqulibandin û carcarna cercûrek dido fişek bi ser binxetîyan de, berdidan qena xwe dîrî sînor bikin, çimkî dayîk û xuşkan xwe bi ser sînor de pelû dikirin û dixwestin xwe bighînin laşê kû maîn pîde hate teqandin û bi xwere bînin, lê ew yek gelekî zor bû, û tu tevdîr jêre nedidîtin û wilo diman tanî roj li wan teng dibû û bi rojava re vedigerîyan û hewar digihandin mîrê şevê, Miradê Sêvê ... xwedî yê ra û tevdîrê!?!?.şin û girîyê zarok û jina, kal û pîran dilê Mirad cor bi cor di qelişînê, û hêzên mîranîyê, muwê laşê wî dirawestandin!?. Mirad evîndarê derbasbûna nav maîna ye, lê pîlan û west jêre divê; gereke şev baskên xwe berdê, û qar bibê! Cilê şevê li bejna xwe dikê, dûrebîna şevê, rext û fişekan li xwe dipêçê, çend paşmêran bi xwere kar dikê, û saloxê cihê teqandîna bimbê hiltîne, û li bîranînen xwe vedigerê, û belavkirina maîna û rêç û şopên wê deverê di bîra xwe de tîne; di hişê xwe de tektîkekê amade dikê, û hêdî hêdî derbasî nav maînan dibê. Paşmêran li pey xwe dihêlê, û dest bi hilkirina bimban dikê, qena bi kurtî xwe bighîne li ser laş! Lingê xwe xwas dikê, û bi bistê arame dikê, lingê xwe bi pîlan di avêjê çimkî ev dever ne cihê ku tu tê de şaşîtyekê bikê, ji ber kû te giyanê xwe di destê xwe de hilgirtî ye... Bi vî zehmet kêşî yê xwe digîne ser çendek!?. Gelo bi ser maîneke dî de laş ketî ye an na; ji xwe dipirsê? Kontrol û arame dikê, û hêdî hêdî laş dikişîne li ser şopa kû ji maînan paqij kirîye û pêhnvedanekê distîne!?. Piştî xwe didê nobetçiyên û di bin çengê çakête xwe de, çixarakê pêdixê, şîna xwe û kerbên dijmin di mizandîna çixarê re derdixîne, û di mîza sîyemîn de agirê wê digîje lîvên wî, û bi tîlyan agirê çixara xwe diperçiqîne!?.

Li paşmêran vedigerê û wan bi jor ve ber bi laşê dibê, nobetçî pêjnê dikê! çend fişekan berdidê, xwe bi zîkve davêjin xakê û bi zîk kişînekê bi pêş ve diçin; nobetçiyê nêzîk, ew jî cercûrekî berdidê û bi dengê fişekan re gundî dikevin xeyala tîrsê; tîrsa kuştina kesekî din jî. Hêdî hêdî Mirad bi şîretên xwe û bi alîkarîya paşmêran, laş digîne binya xetê... .. Berdwwam(21)



## pirtûkên nû

### Tayek Por a Kurteçîrokan derket

Kurteçîrok (Hekat): Tayek Por di nav weşanên Apecê da derket !

„Ez bi zaravayê (devok) gundê xwe mezin bûm û hatim şîretkirin. Lowma tesîra wî zaravayî li ser kurteçîrokên min, hin caran zêde û hin caran kêm heye û va jî tiştekî xwezayî ye.

Her çi qas hewldan û pêşketîyên bi qedr di vî warî da hebin jî, meriv nikane îro qala kurdîyêke standard û seranser bike. Ji b kurdîyêke standard perwerdeya bi kurdî hewce ye. Mixabin hîn em negihêştinê vê qonaxê.

Ji ber vê, ez nivîsandina nêzikî yan di bin bandora zaravayên herêmî da diparêzim û hewce dibînim. Nivîsandina nêzikî zaravayan sewa parêztina heyîyên kulturî û zimanî û teşwîqkirina xwandin û nivîsandina bi kurdî jî bi kêr e. Min sala 1999an destpê nivîsandina çîrokan kir. Çîrokên li ber destê we di navbera salên 1999 û 2009an da hatin nivîsandin û di kovara Bîrnebûnê da hatin weşandin. Rêzkirina çîrokan di kîtêbê da li gorê dema nivîsîn û weşandina wan e. ``Reva Meyro û Mendo`` çîroka min a yekem e û ``Paça pêşî`` ya paşîyê ye. Sewa ku ew baştir bîn xwandin û belavkirin min xwest wan wekî kîteb bidim weşandin.

Paşperdeya heyam, mijar, buyer û lehengên çîrokên min pirtir jiyan û kultura Kurmancên Anatolîyayê ye.” (Ji pêşgotina Kîtêbê)

Peydakirina kîtêbê: Hun dikanin kîtêbê ji min peyda bikin. Gereke hun berê bihayê wê (xercîya şandina bi poste jî tevê) 11 € hewaleyî hesabê li jêr bikin. Ku hewale kîngê gihêste min, hingê ez ê kîtêbê ji we ra bişînim. Ji bîrmekin, navnîşana (adres) xwe li ser belkê hewaleyê binivîsin.



Hesawê min: Nuh Ates, Mainzer Volksbank eG, Konto-Nr: 379262017, BLZ: 551 900 00  
IBAN: DE 94 55 19 0000 0379 2620 17, BIC: MVBMD E55

Hûn dikanin kîtêbê ji wêşanxaneyê Apecê li Swed jî peyda bikin:  
Adres: Box 8121, SE 16308, Spanga/Sverige, Telefax. 0046 (0) 8-7612490

Nuh Ates

**Berdewam ..... Miradê Sêvê 1922-1976**

Paşmêr û laş ber bi gunde ve diçin û Mirad vedi gerê hilkirina maîna!?

Maîne kû pêwîste zû wa bişîne şoreşê!!!??.

Mirad bi vî awayî, û bi hazan kes laşê wan ji nav maînan dianîn der!?

**KOÇKIRINA MIRAD:** Bi roj ava re nêzikayî li sînore navbera Kemalî yê û gundê Cirna kirin kû diketin binya Mêrdîne, ew û kurê xwe Brahîm û bi reşê re derbasî nivê maînan dibûn. Mirad xeta pêşî a ber bi sînore jorîn ve girt, û li pey maîne misînkî diçû, û Brahîm hişte di xeta xwar de berjêrê xwe. Bi bistên xwe ê li xakê didan û cihê maînan pê nasdikirin, bi hostayî hildikirin û li cihê kom dikirin û tanî derengî şevê, herduwan komek bimbê misînkî û beroşkî dane hev, şeva kû bê wê bi çêbekê ber bi xeta rojava de bişînin.

Brahîm kû qederê 50 metrî berjêrê bavê xwe bû, weke paşmêrêkî pêre kardikir, ji nişka ve dengê teqîna maînekê nêzik kir? Di cih de şewt kete dilê wî û bi lez ber bi bavê xwe ve çû, li gihîştina wî, Mirad got: Ka avekê li sînga min bike û vî agirî sarbike!? Û di ber vexwarina çend çixara û gotina eşhedê zû vî mêrxasî giyanê xwe da.

Endezyarê ku maîna pîlankiribû û di xakê de çandibûn, di her cihê de xefket danîbû da kû kesên weke Mirad ji rê bibin? Mirad xweş dizanîbû kû qederê 5nc mitra di nabeyna maîna misînkî û misînkî de heye û mitrek jî, ji a beroşkî dûre? Lê qet neketibû bîrawî kû endezyar dû maîna li ser hev, wê □andibin, û têla maîna jorîn wê ji bin ve bi qepsûna xwar ve wê girêdabe!?, û dema Mirad wê qepsûna a jorîn vekê û rakê, wê ji bin ve têla maîna binî wê bikişîne û wê a bi qesase sere wî bê!?

Brahîm ê ku bi tenêbûna xwe li ber laşê bavê xwe ê bi dar û ber rûniştî bû, hêzên mêranî yê tîne de û dilopek hêsir ji çavên wî nedihatî xwar!? Bi çelengî û bi wê qama xwe a kin û laşê xwe ê weze, dev ji laşê bavê xwe berneda, avête ser piştê xwe û çend gava meşî, taqet nema ew danî!? Bêhnek berdida di hidigirt û dimeşî, û bi vî halê tengezarî û berî zeraqa sibê, Brahîm laşê bavê xwe bi mêranî bin xet kir.

Di wê sibehê de xwe gihande gundê Cirna û bi alîkariya gundîyan cenaze swarkirin û birin ber bi gundê wî ve û ew li wir bi cihkirin.

1 ê çirya pêşî, 2012

Qamişlo - Sûriye

**Berdewam.....****SEROKWEZÎR,****ZERDUŞ Û AVESTA!**

Swêdî jî pirtûkê wergerandîye zimanê Swêdî.

Naveroka "Avesta"yê rêz bi rêz û beş bi beş wehaye: Pêsgotin, Yên Arî kîne? Destpêka dîrokî, beriya îslamê ola Kurdên Aryanî, Bingeha dîrokî ya Zerdûsîyê, Berîya Zerdûs olên Aryanî, Jiyana Zerdûs, Yasna 46:1, Geşbûniya dîroka olan, Di Zerdûsîyê de bawerî û axlaq, Di Zerdûsîyê de kult, Mît û Efsane, Padîsahîti,

Ev beşên jorîn ku min sernivîsa wan nivîsiye ji alî wergêr ve hatiye nivîsîn.

Bejên jêrîn jî sernivîsên beşên "Avesta" ne. Lêbelê ji Avestayê hinek beş in.

Duayên Gata, daxwaziyên pêxember, Ruhên heywanên cotyarîyê, Ruhê gamêşê, Hîsên baş, Du ruh, Duaya Ahunavaîrya, Duaya Asyemvohu, Haoma, ava pîroz ya nemirinê, Pesnê cotyarîyê, Paqijî û pesnê paqijîyê, Li ser Şeytan, Pîrozîya seyî, Îslahkirin, Gunehên mirinê, Dîk, xizmetkarê Sraosyayê, aerisa Şeytan, Mukafata ku hatiye vaadkirin, Ruhên miriyan, Padîsahîya Harenah, Piştê mirinê rewşa ruh, Ji bo Ahura Mazda duaya pesnê.

Hinek beşên ji nivîsîna Zerdûş ya bi zimanê Farisî, çar kural, Ji nivîsînên Darîûs yê li Behîstunê, Ji nivîsînên Darîûs yê li Persepolisê, Ji nivîsînên Darîûs yê li Naksî- Rustem, Hinek wêneyên Zerdûş, û orjînalê Avesta yê.

**Pênûsa nû**

**Sernivîser**  
**Qado Şêrîn**


**Rêvebirê Nivîsînê**  
**Arşek Paravî**

**Desteya birêvebir**  
**Pîr Rustem**  
**Silêman Azer**  
**Ezîz Xemcivîn**  
**Abdilbaqî Huseynî**  
**Lawîn Şêxo**

**Derhener**  
**Xorşîd Şûzî**

**Ji bo hinartina berhe mên kurdi:**  
**kurdi.penusanu@gmail.com**

**F  
R  
E  
E  
D  
O  
M**



**A  
Z  
A  
D  
Î**

**A  
Z  
A  
D  
Î**

**F  
R  
E  
E  
D  
O  
M**